

kovara hunerî, çandî û lêkolînî ya kurdên anatoliya navîn

bîrnebûn

PAYÎZ/2010



bîrnebûn

Tidskriften utkommer 4 nummer per år.
Sê mehan carekê derdikeve / Üç ayda bir çıkar.

Utges av Apec-Förlag AB

Hejmar 47, payîz 2010

Ansvarig utgivare

Ali Çiftçi

Redaksiyon

A. Çiftçi, Dr. Mikailî, H. Erdoğan, M. Bayrak, İ. Türkmen, M. Duran,
Muzaffer Özgür, Nuh Ateş, Seyfeyê Asê, Vahit Duran

Adress

Navnîşana li Swêdê

Box: 8121, SE 163 08, Spånga/Sverige

Telefaks: 0046-(0)8-761 24 90

E-post

info@birnebun.com

Internet

www.birnebun.com

Têkili/İlişki

Danimarka: Irfan Baysal, 0045-27 11 58 83

Avusturya: Cüneyt Dagdalan, 0043-69 91 11 55 294

Amerika: Mam Recall, mamoste.kart@yahoo.com

Belavkirin / Dağıtım

Ewropa: Muzaffer Özgür/Birnebûn

Postfach 900348 , 51113 Köln / Almanya

Tfn: 0049-172 298 24 51

Türkiye/Ankara:

Dipnot Kitebevi, Selanik Caddesi No: 82/32

KIZILAY / ANKARA

Tfn: 0312-419 29 32

Anatolia Muzik Center

Cumhuriyet Mah. Turan Cad. No: 29 A

Polatlı-Ankara

Tfn.: 0090-312-622 94 36

İstanbul: Selahattin Bulut/Medya Kitapevi

İstiklal Caddesi, Elhamra Pasaj No: 130/6, Beyoğlu

Biha/Fiyatı

Europa: 5 Euro • Türkiye: 2,5 YTL

Abone

Swêd: 400 SEK • Almanya 40 Euro

Welatên din ên Ewropayê: 50 Euro

İsveç hesap numarası

(Birnebûn) postgiro: 468 65 12-7

Ji bo aboneyên li derveyî Swêdê / İsveç dışındaki aboneler için

APEC, "Birnebûn" PlusGiro-Stockholm/Sweden

BIC: NDEASESS

IBAN: SE85 9500 0099 6026 4686 5127

Çap / Baskı

Apec-Tryck AB

ISSN 1402-7488



Kombûna kurdên Anatoliya Navîn li Încovê, 20-7-2010

Her nivîskar berpîrsê nivîsa xwe ye.

Mafê redaksiyonê heye ku nivîsên ji Birnebûnê re
tên, serrast û kurt bike. Ger nivîs çap nebin ji, li
xwedîyan nayên vegerandin.

Waqfa Kurdên Anatoliya Navîn li Swêdê û
Komela Ziman li Almanyayê piştgirên kovarê ne.



Wênêyê li bergê:

Noko û Yetê, ji gundê Kalebaltayê
li dor salên 1940î hatiye girtin.



- 2 Ji Bîrnebûnê – *Ali Çiftçi*
- 3 Ka çar delalên ber dilê min – *Altun Başaran*
- 4 Li Swêdê di 19ê îlonê de helbijartin bûn – *Ali Çiftçi*
- 6 Komcivîna li Încovê – *Ali Çiftçi*
- 13 Ji çar saziyan daxuyaniyek hevbeş – *EuroKurd News*
- 14 Keskî – *Seyfi Doğan*
- 18 Lanetli zaman – *Seyfi Doğan*
- 20 Fatê û Emîneya parsek – *Rohat Alakom*
- 25 Tato- *Ali Ceran*
- 26 Lo birao – *Îbrahim Korkmaz*
- 27 Gulê bêdil da – *Îbrahim Korkmaz*
- 27 Bafiroka dilê xêşim – *Xizan Şîlan*
- 28 Deng nekîr – *Mem Xelikan*
- 30 Were – *Mem Xelikan*
- 31 Mîr û cotyar – *Jordan*
- 32 Pêşbirka ceribandîna ya navnetewî – *Nuh Ateş*
- 43 Nar sor nebû (2) – *Mam Recall*
- 54 1. Gelesin Yaz Kültür Festivali gerçekleştirildi – *Ömer Yüce*
- 58 Savaş ve barışın dili üzerine
Türk romanında kanlı yıllar (1980-2000) – *Rohat Alakom*



Destpêka payizê bi du bûyerên balkêş li Swêd û Tirkiyê dest pê kir. Li herdu welatan jî hîlbijartin çêbûn. Di hîlbijartina Swêdê ya ji bo hersê meclîsan de cara yekem partiyeka nîjadperest ket parlamentoyê

Li Tirkiyê jî hîlbijartin ji bo referandûma li ser guhartina destûra bingehîn pêk hat. Encama ku medyayê texmin dikir di van herdu hîlbijartinan de kêr zêde rast derket.

Li Swêdê bi hatina partiya nijadperest têt xuyakirin ku dê karê parlamentoyê wek berê bi hêsaniyê meşandin. Ev partiya SD (*Sverigedemokrater*)ê di navbeyna koalîsyonên, "Alliansen" û "Rödgröna"yê de rola "dengeya teraziye" bilîze.

Di hîlbijartinên îsal de bo kurdan tiştê balkêş ew bû ku kurd di hemû partiyan de aktîv bûn. Ji her çar aliyên Kurdistanê pênc kes wek parlamenter hatin hîlbijartin.

Referandûma ku li Tirkiyê bû ji bo kurdan ji du aliyên ve balkêş bû. Ji guhartina qanûna bingehîn li seranserê Tirkiyê ji %58ê dangan gotin "erê" û li bajarên kurdan jî ji %90î zêtir deng ji bo piştgiriya guhartinê derket.

Li bajarên kurdan tiştê din yê balkêş jî ew bu ku herkesî meraq dikir, ka encama biryara "boykot" a alîgirên BDPê yê çî be. Encama ku em li tevayiyê bajarên kurdan dibînin, ji %60î zêdetir e.

Ev ji bo siyaseta kurdan ya pêşerojê jî girîng e.

Piştî encama dengên referandûmê, serokwezîrê Tirkiyê Recep Tayîp Erdoğan soz da ku ew ê ji bo hemû aliyên civakê amadekariya destûreka nû bikin.

Herkes bahs dike ku bi vê referandûmê dewra desthilatdariya eskerî bi dawî bû û bahsa demokrasîya li Tirkiyê dikin. Lê em ê di rojên pêş de bibînin ka gelo ev referandûma dê çiqas ciyê xwe bibîne.

Gelo vê referandûmê çî bandor li tevayîya kurdan û bi taybetî jî li ser kurdên me yên li Anatoliyê kir û di vê pêwajoyê de rola kurdan divê çî be?

Di dîroka Tirkiyê de ji bo kurdan herwiha bo kurdên Anatoliyê jî ev guhartin gaveka girîng e. Li navçeya Anatoliyê em xwediyê taybetmendiyên cûda ne. Ev referandûm ji bo destxistina gelek mafên bingehîn rê veke jî divê dawxazên me yên hevbeş û konkret hebin. Bi kêmasî di warê ziman de perwerdeya bi kurdî û di dezgehên fermî de jî bi karanîna zimanê kurdî û herwiha navên cî û warên kurdî ku hatine guhartin şûnve bînin bi karanîn.

Bi ya min em wek kurdên li Anatoliyê divê li ser vê mijarê serê xwe biêşînin ku bi hemû aliyên xwe yên civakî ve bibin xwediyê daxwazên hevbeş.

Ali Çiftçi

KA ÇAR DELALÊN BER DILÊ MIN

Amadekar: Altun Başaran

Malbateka ji Xelike jêr (Gölyazi) bar dikin Omara ku li wir şivaniyê bikin. Malxê malê bi bermalî û çar zarokên xwe ve li wir bi şûn û war dibin. Bav tere ser karê xwe û zarok jî terin derve ku bilizin. Li gor xeberên ku di rojnaman de hat belav kirin, tê gotin ku zarok di xaniyekî wir da, dema dilizin, di xênî da buzdolabeka kevin hebûye,

her çar zarok jî dikevin dolabê û derî li ser xwe digrin. Ne kes wan dibîze û ne jî dibîne...

Harçar bi hev ra bê can dimînin. Xadê derdî kezebê nede kesî. Xadê sebra xwe bide malbata van zarokan.

Dê li ser çar zaroyên xwe van gotinan distirê. Agir ketiye kezebê û dibê:

Hawar, hawar xalikan xwe bi min gînin

Mala min, li min şewitî

Ma geli qom herçar delalên dilê min bi doxtir gînin

Solixê bidin wana arî kezawê min vemirînin

De rabin cigera gazi min bikin!

Çima hûn razane wake cesedan!

Hawar Xalikan! Ew çi tofan û afet e!

Hatiye ser neviyê malê Cirtên e!

Ez a bangî her çar bexê xwe yên çavreş kim!

Dayik bû qurban, keçê Aynur serî xwe rake!

Lavo Ozan, Sayme, Ebru we ez hiştim bi tenê

Çerxa felekê li min xiste ez mam li gundê Xelka bi tenê

Çima ez namrime, bûm qurbana çar tabûtên dane ber malê

Werine min bêkesê, doxtor sîngê çar delalên min dana ber meqesê

Ê ne min wana mezin kirin bi xizanî, bi nezanî, bi laşê canê xwe

Te dît çîng yek bi yek, xopana dolabeka kevin da man bênefes û bêcan

Ez a biskê perçemê xwe biqetînim

Ez a pîst û çar saatan xwe bidim balgiya wan li goristinê

Ez a hertim bêjim ka çar delalên ber dilê min

Hetanî ku ev solix di solixê min da ma!

Li Swêdê ji bo her sê meclisan di 19 îlonê de helbijartin bûn

Ali Çiftçi

Helbijartina 19ê Îlonê ya îsal ji çend aliyên ve balkêş bû. Partiyên çep bi koalîsyona bi navê kesk û sor (*Rödgröna*) û partiyên muhafazakar û liberal yê aligirê rast jî bi navê koalîsyona "*Alliansen*"ê ketin hîlbijartinê. Herdu koalîsyonan jî nikaribûn piraniya dengên derxînan ku bi serê xwe hukumeteke nû ava bikin.


Cara yekem e ku di dîroka Swêdê ya modern de partiyeka nijatperest ya bi navê *Sverigedemokrater*(SD) ku bi şîyara li dijî politikaya Swêdê ya li hember xeriban jî bo parlamentoyê hat hîlbijartin. Li tevayîya Swêdê jî %5.7 deng wergirt û bi 20 parlamenteran ve ket parlamentoya Swêdê.



Roza Güçlü Hedin,
ji partiya karkerên Sosyaldemokratan
(*Socialdemokratiska Arbetar Partiet*).

Piştî encamên fermî yê hîlbijartinê Swêdê, partiyên ku li iktîdarê bûn, yanê koalîsyona bi navê "*Alliansen*"ê 173 parlamenter û yê koalîsyona bi navê sor û kesk Partiya Sosyaldemokrat (*Socialdemokratiska Arbetar Partiet*), Partiya Çep (*Vänsterpartiet*) û Partiya Kesk (*Miljöpartiet*) jî 172 parlamenter wergirtin. Ji bo avakirina hukumetê pêwîstî bi 175 dengên heye. Tiştê ku tê xuykirin ew e ku hukumetê dîsan jî aliyê koalîsyona bi navê "*Alliansen*"ê ve bê avakirin.

Ji salên 1970 û 1980î ve jî her çar aliyên Kurdistanê kurd wek penaber hatin Swêdê. Helbet piraniyan wan jî ber rewşa



Jabar Amin,
ji partiya Keskan (*Miljöparti*).

siyasî ya welêt mecbûr mabûn û hatibûn li Swêdê bi cih bûbûn. Ji ber rewşa wan a siyasî pir tabîî bû ku insanên me li derveyê welêt jî di nav partiyên siyasîyên Swêdê de jî aktiv bin. Ev hîlbijartina îsal bo me kurdan bo encama xebata siyasî ku ji çar perçeyên Kurdistanê jî pênc namzedên kurd ketin Parlamentoya Swêdê.

Ji partiya kesk (*Miljöparti*) **Jabar Amin** ji başûrê Kurdistanê ye û li herêma



Riksdagsledamot (s)

نه‌ندام پارله‌مان (سۆسیالدموکرات)

Shadiye Heydari.

ji partiya karkerên Sosyaldemokratana (*Socialdemokratiska Arbetar Partiet*).

Västerbottenê (Umeå) kete parlamentoyê.

Ji partiya karkerên Sosyaldemokratana (*Socialdemokratiska Arbetar Partiet*) **Roza**

Güçlü Hedin ku ji bakurê Kurdistanê jî kurdên Anatoliyê ye, li herêma Dalarnayê

û **Shadiye Heydari** ji rojhilatê Kurdistanê ye ku ew jî li herêma Göteborgê, ji partiya

Liberal (*Folkpartiet*) **İsmail Kamil** ku ji rojavayê Kurdistanê ye, li herêma Upsalayê

û ji partiya Çep jî (*Vänsterpartiet*) **Amineh**

Kakabaweh ji rojhilatê Kurdistanê ketin parlamntoya Swêdê.



Ismail Kamil,

ji partiya Liberal (*Folkpartiet*).

Em wek redaksiyona kovara Bîrnebûnê wan pîroz dikin û di karê wan yê siyasî de serkeftina wan hêvî dikin. Bi hêviya ku ev dê bibin nimûneyên baş ji bo neslê nû.



Amineh Kakabaweh,

ji partiya Çep (*Vänsterpartiet*).

Komcivîna li ser tarîx, ziman, mîrasa çandî ya kurdên Anatoliya navîn û globalîzm li Încovê

20/07/2010

Ali Çiftçi

Piştî komcivîna kurdên Anatoliyê ku li li Kopenhaga Danîmerqê di 29 gulanê de çêbû, biryarek ji aliyê komîta komcivînê ve hatibû girtin ku li welêt jî, li Încovê li ser heman babetê komcivînek bê avakirin. Armanca komcivînê ev bû ku pirtir tahlûka li hember çand û zimanê kurdî li herêmê bê aktualîzekirin û herwiha girîngiya perwerdeya bi zimanê dayîkê bê rojevê.

Komcivîn di 20ê meha temuzê bi organîza Komîta Însiyatîfê Mahmut Erdem, İrfan Baysal, Enver Kesen, Osman Cıfci û bi hevkarîya Serokê şaredariya Încovê İlyas Kara ve li salona şaredariya Încovê piştî nivro dest pê kir. Pîraniya şaredarên gundên derûdora Încovê, wek Hecilera birêz İsmet Karaca, jî Kelhasan Resul Kara, serokê belediya Kendilê birêz Hasan Çam berpîrsên partiyên kurdan yê li herêmê beşdarî komcivînê bûn. Li gor rojevê, Muzaffer Özgür komcivîn bi zimanê kurdî bi rêve bir. Muzaffer bi kurtî li ser babeta komcivînê agahdariyek da, **İlyas Kara**, serokê belediya Încovê, xêrhatina mêvana kir.

Li ser navê Komîta Însiyatîfê **Mahmut**



Serokê şaredariya Încovê İlyas Kara.

Erdem jî xêrhatina mêvanan kir û girîngiya *Kriterên Kopenhagê* anî ziman. Rewşa kurdên goçber yê li welatên Europayê û bi taybetî yê Danîmerqê ku bi problemên nû yê nasnameyî û perwedeyê anî rojevê. Erdem di gotara xwe de di-san li ser kovara Bîrnebûnê sekinî, rola wê ya ku ji aliyê çand û ziman ve bo kurdên Anatoliyê çiqas bûye û girîngiya berdewamiya derketina kovarê anî ziman.

Li ser dîroka kurdên Anatoliyê û koçberiyê birêz **Nuh Ateş** wiha dest bi go-



Dîwana komcivînê: Enver Kesen, Prof. Dr. Halil Sariaslan, Nuh Ateş û Dr.Nebî Kesen.

tara xwe kir û domand: *Navê Anatoliya bi yonani ye û tê meneya "Rojhelat". Cografya Anatoliyê li rojhelatê Yonanîstana kevn diket, loma Yonanên wê demê jê ra gotin "Anatolî". Anatoliya giravekê berve rojavayê ye. Berê, tenê ji hêla wê ya berve rojavayê ra digotin Anatoliya. Dewrana Romayê ji Anatoliyê ra berê "Asya" û paşê "Asya piçûk" digotin. Van herdu navan jê tekebulê nivê Tirkîyeyê rojavayê dikir. Osmanîyan ji Anaotoliyê ra digotin "Rum". Kurdan berê digotin "Rom". Bi kurmancîya huro hen jê ra dibên, "Enedol" hen jê dibên "Anatoliya". Bi ya min, navê "Anatoliya" hîn rind lê tê. Tirkan navê*

Anatoliyê helnan û kirin "Anadolu".

Ateş, piştî ku dîrûdirêj li ser dîroka koçberîya Kurdên Anatolîyayê û dan û standinên di navbera Kurdistanê û Anatolîyayê da deng kir bi şûn de, li ser sebebên goçberiyê wiha domand:

... koçberî veqasî tarîxa merivatîyê kevn e. Sebebên vê jî pir çeşîd in. Geh ji ber şer û tofanan û geh jî ber talankarî û zordariyê yan jî ji bo omdiya jîyaneke serbest û têrgezenc xelk û komên merivan koç dikin û dêv didin warên yad. Kêm û zêde huro jî koçberî ji avrûyên sebebên han da di-ajo. Kurd û ejdadên wan ji ber sebebên



Dîmenek ji komcivînê.




Dimenek ji salona civînê.

sîyasî, eskerî, îdarî û debariyê herdem bi ber derbeyên surgun û koçberiyê ketine. Êrişên koloniyalistî yên hêz û dewletên ji hev cihê û şerên wan yên li ser bidestxistin û parvakerina Kurdistanê û berxwedanên kurdan li dijî wan jî pir caran bûne û dibin sebeba surgun û koçberiyên. Wekî van, şerên kurdan yên navxwe jî bûne sebeba barkirin û

belavbûnan. Di her çaxê da beriyê koçberiya kurdan yan jî bav û kalên wan ji Rojhelatê berve Rojava û Bakûrê Rojavayê bûye.

Çend mîsalên ku li jor û li jêr hatine rêzkirin aşkere dikin ku ji demên antîk û klasîk vir da, Anatolî bûyê warê surgun û koçberiya kurdan, bûye welatê wan yê duduyan...



Serokê şaredariya Xelika, Mulla Şimşek.



Ji BDP Mehmet Bozdağ.



Ji Komîta Însiyatîfê Îrfan Baysal.

Li ser *rewşa ziman û perwedeya bi zimanê dê Ali Çiftçi* bi PowerPointê nimûneyên ji Swêdê û herwiha li ser *duzimanî û pîrzimaniyê* deng kir. Çiftçi bi gotina; ***Ziman û zarokên me hebûn û pîrozîyên me ne!*** dest bi gotara xwe kir. Girîngiya zimanê dayîkê di kesayetiya zarokan de ciqas tesîra xwe heye sekinî û li ser zimanê devkî, nivîskî û perwerdê wiha berdewam kir:

- *Zimanê devkî hewqas ne berfireh e û li gor hewcedariya(Îhtiyaca) rojane ye.*
- *Di zimanê devkî de zarava û devok hene û bêser û ber e.*
- *Zimanê devkî ji bo meriv nikare zêde bifikire, dubare dibe û zêde wext digrê. Meriv gotinên ku şaş dibêje an jî ne di cih de ne, nikare sererast bike. Encax bi gotin û hevokên din dikare şaşîyan sererast bike.*
- *Di zimanê devkî de deng û lûvkirina*

gotinan li gor herêman e. Loma dikare baş neye fêmkirin.

- *Di zimanê devkî de axaftvan bi serê xwe ye û îmkânên wî lwê tune ne ku ji kesekî din, ji ferhengê alîkariyê bigre.*
- *Zimanê nivîskî û perwerdê berfireh û dewlementir e.*
- *Di zimanê nivîskî de rê û rêbazên giştî hene. Yekîtîya ziman heye.*
- *Zimanê nivîskî ji bo ku meriv difikire û piştre dinivîse kêma şaşîyan dîke û baş formule dîke loma dubare kêma in.*
- *Zimanê nivîskî li gor rêzimanî tê nivîsîn, loma rast tê xwendin. Bîhn û dengên herêma kêma in.*
- *Di zimanê nivîskî de meriv dikare li ferhengê binêre, nivîsê pêşî bide kesekî din û redakte bike, pêşniyaziyên xwe bêje.*

Li ser zarok û ziman jî weng berdewam kir: *Zarok heta heft saliya xwe bi zimanê dê*




Ji malpera gundê Altîlerê Ahmet Gezer.



Ji HAK-PARê Fehmi Demir

hîn dibe û dizane. Dema ew dest bi dibistana sereta dike, heger perwerde û hîndekari ne bi zimanê dêya şagird be, ew zimanê ku heta heft salan hîn bûye dimire. Zarok dest bi zimanekî din dike ku fêr nake. Li gor lêkolîna Hyldenstam a sala (1996) û lêkolîna Håkansson a sala (2003) an dema zarokek tê dibistanê tenê 6-7 salî ye, ew 8 000 -10 000 gotinan dizane. Dema dibistan bi zimanek din be, wê demê 8 000 -10 000



Ji komela Gölsağê Huseyin Kerpiç.

gotinên ku ew dizane bi carekê de ji mêjiyê wî/wê tîr paqij kirin û hejmara gotinan dibê sifir. Bi ser re jî dikeve rewşeke ne baş a psîkolojîk. Ew bi carekê de ziman û nasnameya xwe wenda dike.

Di serdema me de her ku zanyarî bi pêş dikeve û demokrasî berfireh dibe, li her derê cihanê perwerdeya zimanê dê xurt û geş dibe. Divê neyê ji birkirin ku zarava jî zimanê dê ye.

*Herweha UNESCO jî di ropereke xwe de weha dinivîse: ji çend generasyon şûn ve nivê zimanên ku niha hene dê wenda bibin. Loma rêxistina UNESCOyê vê carê jî roja 21ê sibatê kir **”Roja Zimanê Dê”**.*

Zarok dikarin çend zimanan bi hev re fêr bibin. Mêjiyê meriya dikara pir zimanan ji hev derxe. Eger însanên ku nêzikî zarokekî ne bi zimanên cuda cuda deng dikinê zarok dikare wan zimanan fêr bibe.

Bo nimûne: Ariya ji malbateka kurdên rojhilat e. Ew bi çend zimanan dizane. Malbata wê giştîk jî bi çend zimanan deng dikan. Ariya bi dêya xwe re bi tirkî û bi bavê xwe re jî bi kurdî rojana deng dike. Bi dapîrê xwe re jî bi farsî deng dike. Dapîr jê ra çîrokan dibê û qala zaroktiya xwe dike. Ariya û havalên xwe bi çend zimanan dizanin. Ew bi bevalên xwe re bi tirkî, farsî û kurdî deng dike.

Merivên bo însanekî girîng zimanê wan jî girîng e. Malbat (aîle) ji bo zarokekî pir girîng e. Ji bo wê jî zimanê malê(dê) jî ji bo zarokekî pir girîng e.

Ziman ji hez kirin û nêzikbûnê ve pêş dikeve. Zimanê ku meriv ji zaroktiya xwe fêr bûye bi hisên pir kûr ve girêdayî ye.

Ev kesên ku pir zimanan dizanin ji bo her zimanekî hîsên xwe yên cuda çêdibin.

Zimanê listikê ... Zimanê dibistanê ...

Dema meriv naxweze bi zimanekî deng bike: Azad bi erebî dengkirinê rihetsiz di-be ji ber ew zilma ku li welat tîne bîra wî. Maria dema bi zimanê xwe deng dike bi şeng û beng û kêfxweş e.

Sebebên ku nahêlin zarokek zimanekî fêr bibin çi ne?

- *Zarok zimanê însanên ku jê hez dike dixwaze fêr bibe. Eger sar li zarok bêt temaşe kirin hêdî ev ziman ji bo zarok hewqes bal nakişîne.*
- *Haval ji bo hewcedariya zimên pir muhîm in. Lê li nav gruba zarokan bibûn tenê têrê nake. Divê bi grubê ra be.*

Zimanê pêşiyê ji bo kesayetiyê xwediyê roleke mezin e. Ji bo fêrbûna zimanê didû û sêsiyan bigebeke hêzdar datîne.

- *Dibe xwedî paye*
- *Parastina mîrasên ziman û çandê*
- *Raman(fikir) bi pêş dikeve*
- *Bi alîkariya zimanê xwe zimanê biyanî zû fêr dibe*
- *Kesayetî xurt dibe, li xwe xwedî derdikeve û xwe nas dike*
- *Rola xwe baş fêm dike û dikare bibe alîkar...*

Perwerdeya bi zimanê dê:

- *hestên wekhevîyê (em) xurt dike*
- *pêwendî û hevkarîyên rast geş dike*
- *bi xwe biryaran dide û berpirsiyarî digrê*
- *pêşketina projeyên hevkarîyê û civaknasîyê fêm dike*
- *xurtkirina daxwazên biçûk ên lêgerînê û lêkolînê li gel çêdibe.*



Seroka BDP a Konyayê, Aynur Cengiz.

- *bi komên din, ziman û çandên din re têkilîdayîn û naskirin bi pêş dikeve.*

Ji bo parastina zimanê dê ev pêşniyarî hatin kirin:

- *Ji bo ku zimanê me wenda nebe divê em xwedî daxwaz û projeya bin.*
- *Wek dê û bav divê em bi zarokên xwe re bi kurdî deng bikin.*
- *Li gund û bajarên ku kurd lê dimînin em daxwaza zimanê fermî yê kurdî bikin.*
- *Ji bo perwerda bi zimanê kurdî em ji dewletê wek hemwelatîyekî daxwaza mafê xwe bikin.*
- *Ji niha de, heta ku pir dereng nemaye, em dest bi kursên xwendin û nivisandina kurdî bikin li hemû gund û bajarên.*
- *Belediyên (şaredarî) ku kurd lê dimînin dikarin ji bo vê projeyan amade bikin hem bidin dewletê û hem jî bidin YE.*

Piştî gotara li ser ziman û perwerdeya bi zimanê dê, ji Komîta Înstiyatîfê Îrfan Baysal, ji BDPê Mehmed Bozdağ, ji HAKPARê Fehmî Demir, ji malpera gundê Altilerê, Ahmed Gezer, şaredarê



Prof. Dr. Halil Sariaslan.

Gölyaziyê Mulla Şimşek, Serokê BDPê ya Konya Aynur Cengîz û li ser navê komela GÖLSAĞê jî Huseyin Kerpiç dîtin û mesajên xwe bi gotarên kurt dan.

Prof. Dr. Halil Sariaslan li ser hêzên global ên civakî û aborî/Küreselleşmenin sosyo-ekonomik dinamikleri gotara xwe bi zimanê tirkî kir. Di destpêka gotara xwe de birêz Sariaslan wiha got: *...di pir civînên navnetewî û di konferansan de min deng kiriye, lê ti carê ew heyecana ku îro li vir, di nav însanên xwe de hîs dikim, li tu komcivînên din de bi min re çênebûye!... Vê komcivîna îro heyaceneka din da min ku ez nikarim bi gotinan ji we re izah bikim.*

...mîvanên bi rûmet, dema me dema interaktiv, dema internetê, dema ragihandina di rêya azman de ye. Hêdî globalizmê gelek sînor ji ortê rakirine. Ew guharin û pêşketina ku îro li dinyayê rûdaye, em jî parçeyek ji wê ne, Turkiye nikare xwe li derveyî wê pêşweçûnê bibîne...

Li ser mesela zimanê kurdî ji wiha dewan kir û got: *...îro, hêdî malbatên me li her welatekî Ewropayê belav bûne, carna li havînan dema tên îznê heryek bi zimanekî ewropî deng dike, hêdî wiha bûye ku em ji xwerzê û birazên xwe an jî pismam û dotmamên hev ji hev fêhm nakin...*

Li ser Yekitiya Ewropayê (YE) û Tirkîyeyê ekonomîst, birêz **Dr. Nebi Kesen**, bi kurdî xêrhatina mêvanan kir û weng got:

...bi rastî, cara yekê ye li Încovê tev konferensekê dibime û wek hevalên din min jî wazîfek girtiye. Divê ez li ser Yekitiya Ewropayê û Tirkîyê çend tiştan bînim ziman. Ji bo ku hûn gotinên min fam bikin, ez ê gotara xwe bi zimanê tirkî bikim. Daxwaza me hemûyan ew e ku rojekê civîn û konferensên me tenê bi kurdî bînin kirin. Hevalên hêja Nuh Ateş û Elî Çiftçi gotarên xwe bi zimanê me kirin û nimuneyeke baş dan ber çav. Ji dil sipasiya her du hevalan dikim.

Birêz Kesen gotara xwe bi tirkî li ser pêvajoya YE û Tirkîyeyê berdewam kir.

Komcivîn bi pirs, bersiv û pêşnîyazên ku hatin kirin ve di wexta xwe de bi dawî hat. Piştî civînê şaredariya Încovê, mêvanên ku ji der ve hatibûn li restaurangekê dawetî xwarinê kirin.

Em li vir jî şaredariya Încovê re dibêin mala we ava, we mêvanperweriya xwe û deriyê salona xwe ji me ra vekir.

TRT6 û KonTv jî di komcivînê de hazir bûn. KonTvê xebera civînê heman demê de dabû. TRT6ê jî bi programeka taybet li ser rewşa zimanê kurdî, komcivîn û kurdên Anatoliyê, bi bejdariya Ali Çiftçi û Îlyas Kara belav kir.

Ji çar saziyan daxuyaniyek hevbeş

Li gelek peyman, şert û dokumentên navneteweyî, wek Yekîtiya Netewan (UN) UNESCO, UNICEF, Yekîtiya Ewsropa (EU) û her weha Peymana Mafên Zarokan de, mafê zimanê dayikê û perwerdê mafekî herî bingeîn tê pejirandin.

Dewleta Turkiyê jî gelek ji wan peymanan îmze kiriye. Lê dîsa jî 20 milyon kurd ji van mafan bêpar in. Bi milyonan zarokên kurd bi zimanekî biyanî, weke tirkî, têne perwerde û asîmlekirin. Çand û zimanê kurdî di sala 2010 de jî hê qedexa ne û kurd di bin xetera jenosîdeke çandî de ne.

Ger asîmilasyon wek wahşetê dijî merovatiyê tê binavkirin, dewleta Turkiyê vê wahşetê îro jî dike. Ne zimanê kurdî weke zimanê fermî tê naskirin, ne jî zarokên kurd bi zimanê xwe têne perwerdekirin.

Em her çar saziyên li jêr, ji rêxistinên navneteweyî û Yekîtiya Ewropayê daxwaz dikin ku bo naskirina zimanê kurdî li ser Turkiyê zextê bikin û rê nedin ku zimanekî kevnare û dewlemend weke zimanê kurdî bihele û wenda bibe.

Em gazî gelê kurd û saziyên kurdî dikin ku karên xwe yên rojane bi zimanê xwe bikin û wisa jî rê li ber asîmilasyonê bigrin.

Her zarokê gulek e.

Nehêlin ku gulên Kurdistanê biçilmisin!

Bruksel, 22.09.2010

Prof. Dr. Celîlê Celîl, Instituta Kurdzaniyê li Viyanayê

Dr. Huseyn Xeliqî, Înstîtuya Kurdî li Stockholmê

Memo Sahin, Pro-Humanitate li Köln

Derwêsh M. Ferho, Enstituya Kurdî li Brukselê

EuroKurd News / Stockholm

KESKÎ

Seyfi Doğan

Av û ax ji çar elementên ku bingehiyên jîyanê ne. Yên din jî agir û hewa ye. Av û ax, du aşiqê ku va milyar sal in bêhevdu nabin û aşqê wanan hîngê wek rojê siftê teze ye. Av û ax du elementên ku hevdu temam û dunê dewlement dikin in. Xwedê, însan ji çamurê xulk kir. Çamur ji ax û avê tê çêkirin. Yanê av û ax kokê jîyanê û qelwîya dunê ne.

Li gor kitêbên qutsîyê xiristanan û misilmanan dema ku Xwedê dunê peyda kir, demekê baran nebarand. Xwedê însan xulk kir bi şunda ji bo

ku însan xwe xwedî bike baran barand û dunê tiji xwarin bû. Daristan peyda bûn, çeşît û çeşît heywan li ser dunê peyda bûn. Herder bi darên meywe xemilî, hêşin û kesk bû.

Rengî kesk bereket û rêfahî ye. Hêvî û firehî ye. Zêdehî û zengînî ye. Zindî û azadî ye. Xwebewarî û aramî ye. Parvakirin û comerdî ye.

Rengî kesk, sembola biharê ye. Biharê, di dema mitolojîye da, keçikên bedewî, fodil û bişuret temsil dikirin. Wek Xwedê ya bereketê Anahîta, keçika navzirav û kalçehot. Mîna Artemîsê,



Baxçê Hesmanî Şêmlî, ji arşîva Seyfi Dogan

bi hezar pesîrî. Artemîs parêzgerê Istanbûlê bû û sembolen xwe nivhîv û hêstirk bû. Mîna persefone. Keça Demetere û bi şureta dunê ku Hades-xwedê dunê mirîyan e- ji xwe re rivandîye. Li gor pêymanana ku di navbarê Hades û dîya wê Demeter da-Persefone her biharê ji dunê mirîyan azad dibû û derdiket ser erdê. We wextê herder reng û bireng dibû. Dunê bi rengî kesk û hêşin dixemilî. Tuneyî, dest-dengîyê zivistanê derd û kul teva dibû. Bollixiyê dest pê dikir.

Rengî kesk li ba Zerduşt pir heja bû. Sembola mergan û dewlemendîyê bû. Rengî kesk berekete çêrê bû. Li gor dînî Zerduşt Mazdaizmê, kê zerar dida kesk, hêşinîyê û merga bi cezaki pir giran dihat cezakirin.

Mîtra, di mîtolojîya kurdan da cîhê kî xwe yî hêja heyê û Xwedêyê dînî Mîtra ye. Li gor mîtolojîyê, Mîtra, Xwedê yê mergan û keskî ye. Mîtra avan diherikîne, mergan diparizîne û baranê dibarîne ku merg û ax kesk bibin.

Li gor dinî Muhammed kesk sembola paradîsê û rehatîyê ye. Wexta ku meri mêlê xwe dida camîyê wek Alhambra û Tac Mahal, baxçên wan wek baxçê cennetê hetine tesawur kirin û bi avê û daran xemilîne.

Newrozê, sembola xwe kesk e. Rengî newrozê yî kesk, rengê ala kur-

distanê ye û berketê temsîl dike. Dema newrozê, dema heyîyê ye, dema ku berx li ber kozê bi diyên xwe va tama berroj dertixine, dema ku av li didanê tebiatê dihilîze, dema ku jîyan li zozanan gul vedike ye. Berê, li biharê keçên bermirad herdu alîyê porî xwe destek ji genimî ku nû li kêle nihiştî dixemilandin.

Li dawîyê çîyayî inê gewr, li nav terlê Şêmlî(Şahin Gündogdu) Hesmenî Şêmlê (Osman Gündogdu) havîngeheke xwe î ava kirîye û darên danane. Darên zerdalan, guzan, ayvan û darên behîvan û çimenî rêxistîyê. Li herema ku di guna yunanîyan re bi navî Axylon dihate xwandin. Axylon peyveke yunanî ye û tê mana cîhên bêdar.

Ew çola, ew ruma rûtik û boz-kira Anatoliya rep û rût ê şên bûye. Darên teze yê xwe li ber bayî bakur mîna keçikên bermirad ba dikine. Çuçikên hewayê ji darekê difrine darakê. Qirikên belekê bi kelek û zavaşên Kemêl xenê bûne.

Kurm û kêzê bi xwarin û vexwarinê dilşa ne. Însan qor bi qor dihatin, bexçê ziyaret dikirin. Wana digot; ruhên me yê fireh dibine û çavên me yê li keke û pişoyê havînê bi keskîyê daran û çîm vêdêsêne. Lingên xwe yê xwas dikirin nav ava ku ji lolib sar û sar diherikî û di ber xwe da digotin; "Dunê hebû ye lo!" Li germa havînê,

avake sar a însanan kêfxweş bike.

Zîyareta wan însanan, îspat dikir ku însanî hewcîyê keskîyê û dûneke teze ye. Av, av û dîsa av. Di piranîyê dî-nanda av şênayîya cennetê ye.

Kemalî Husî Zexê Xoca (Kemal Gündoğdu) berî çend salan ber vê, di terlê wanan da bîreke avê lêxisti bû. Bi ava wê bîrê î îro daran û çîmen av dike.

Wexta ku min av, hêşin û hêşin li ser çîmen dewatkar diherikî didît, ez ji rê derdiketim, jihevdu diçûm û radigerîm û min dixwast li wê germê çolê Xelikan li ser çîm xwe di nav wê avê da lût kim û ji dûra xwe bi ber rojê dim. Carek an jî du caran min xwe da ber avê lê zîncirên kevneparêzên ku edî tu hukmê xwe nemane wek bendekê xwe dabûn ber avê û serê min hêsîr heynabûn.

Adetên baş in lê gerek xwe li gor demê xwe biguherin. Adetên zindî ne û gav bi gav tî guhertin. Lê henek adet hene him hatine guhertin di praktikê da najîne lê bi devkî hîng jîyana xwe berdewam dikin.

Emek bingehiyê zengînîyê dunê ye. Hemî berhemên li ser dîwê bi emek hatine peyda kirin. Neynika însan berhemên xwe ne, şoran tu hejayê xwe tune. Ji tenê kibîrtekê da bigre, he-ta fuzên ku difirin ezman, emegî xuya henî ye.

Kemalî Malê Husî Zexê Xoca (Kemal Gündoğdu) emegêkî pîrî daye dergehê. Mala wî ava be. Kî min hîng bîr nekîrîye gerek ez navî karkerê Kemêlî ji afganistanê jî heldim. Navê wî Muhammed bû. Mala wî jî ava be.

Ez hêvî û bawer dikim ku însanên



Ava ji baxçê Hesmanî Şemlî, ji arşîva Seyfi Dogan

din ji ê rojekê, dest bi dar dananê bikin û malên xwe ava bikin.

Min rojên hundir tiji û bi ken li dergehê derbas kirin.

Mala Hesmanî Şêmlî ava be derîyê mala xwe ji me ra vekir.

Mala Suat kiliçkaya ava be, ereba xwe ji me ra netêvişand û bi bilûr û yaranîyên xwe dişliqê me hunî û dunê me qelew kir...

Mala Kemal Gündogdu ava be, em bi kilamên xwe coş kirin û ava bîrê em ji germê parastin.

Mala Doktor Haco ava be, (Mehmet Dogmuş) bi sazî xwe em xenê kirin.

Mala Nuhî Hesê ava be, bi kilamên xwe yê kilasîk em li demên kevn gerandin.

Mala Mehmî Nekîm ava be (Lutfî Özsoy) bi yaranîyên xwe em kenandin.

Mala Remazanî Dedî Malê Atkê ava be (Ramazan Çiftçi) bi henek û zarekirinên xwe em şa kirin.

Mala Oskî Çîno (Osman Akyuz) ava be, bi yaranî û komenterên xwe yê zekî dunê me fireh kir.

Mala Bilî Cemêl (Bilal Akbaş) ava be, zikê me bi qewirmê têr kir û bi henekên xwe mejoyê me serxoş kir.

Stockholm 2010-09-01

Hesret

hesret ne karê te ye
zehmet e
jîyanê wek qurşûnê giran e
felsefe û hêvî
tesselîyên xweş in
ê pêşbazîyê bikin
rojên derbas dibine
avên diherikine
aşqên zer dibine
dengî kilamên dila û şîna
yê giran û giran têne
vegere

li xelikan jîyan a li te were
ki hîng germiyên şopên te sar nebûne
ki hîng yek bi yek
dûmanên malan venemirîne
ki hîng henek nasên te hene
vegere

şoreke xweş a ku ji lêvên ku tu jê hez dikî
a ruhê te fireh bike
û dereng be jî teseliyeke kur e
a dunê te bixemilîne
were
ki hîng gulên sifteh neçilmisîne
vegere

Seyfi Doğan

LANETLİ ZAMAN

gece rüzgarının
şöyle yalayıp geçtiği başakların
sesleri dinmeden
uykunun kurşun geçirmez deminde
geldiler

herzaman ki gibi
bir başıma ve çocuklar
duvarın dibine sızmış kalmışım
kucağında altı aylık kızım evin
kapının aralağında
dişlerini bahar toprağına geçirmiş
aç ejderhalar gibi homurduyan
tankların namlularını gördüm
namlular
ay ışığında
haram kasapların
nöbetteki hırsız bıçakları
gibi parlıyorlardı

çok geçmeden
tankların gövdesinden
elleri kötü kalem görmüş
gözleri kötü kitap okumuş
kulakları kötü söz işitmiş
iğdiş ve iğfal edilmiş
öldürme iştahları
modern silahlarla bilenmiş
her türlü çılgınlığa açık
duello kültüründen yoksun
mavi gözleri çakmak çakmak
sarışın birer kurda benziyen

ölüm ayinlerinden dönen
kırıcı ve çirkin
anılarımın sahipleri
tabiatın o en korkunç yüzü
o insanlar indiler

barbar uşak
vahşet içinde
gecedir saklar kahpelikleri
sesi duyulur çocukların
yangınlar
alevler
ve çığlıklar
kızarmış et kokan dumanlar
ve mechule giden canlar

seni yollarda gördüm
seni caddelerde ve sokaklarda gördüm
seni etrafına boş boş bakarken gördüm
seni üşürken gördüm
seni ekmek peşinde yuvarlanırken gördüm
seni kötü sözleri dinlemeye mecbur edilirken gördüm
seni görmek ve görülmek istemediğin yerlerde gördüm
seni anlamadığın bir dille azarlanırken gördüm
seni şiddetin pençesinde parmaklıkların ardında gördüm
seni mezopotamya toprağı kadar bereketli ellerini açarken gördüm
seni ruhunu bıraktığın yöne bakarken gördüm
seni bagbozumunu düşlerken gördüm
seni gözyaşlarını gömerken gördüm
seni saçlarını yuvarlak cep aynasında tararken gördüm
seni dağları emzirirken gördüm
seni gözlerinin birer ateş kıvılcımı gibi gözlerimi yakarken görüyorum
ama ben seni güneş gibi sıcak ve aydın gülerken görmek istiyorum.

Seyfi Doğan

Fatê û Emîneya parsek

- Du afrendeyên li paytexta padîşah -

Rohat Alakom

Îsal çawa tê zanîn bajarê Stenbolê wek “Paytexta çandî ya Ewrûpayê” (2010) hatiye hîlbijartin. Lê belê ev kurdên ku hejmara wan îro digêhêje mîlyonan, ev nêzîkî sedsal e ji çanda xwe bêpar mane û gelek îronîk e ku ev zordestiya her wisa jî îro di navenda “Paytexta çandî yê Ewrûpayê” de tê meşandin û heta roja îroyîn jî dawî lê nehatiye. Ez vê nivîsa xwe pêşkêşî bi mîlyonan kurdên Stenbolê dikim ku ev “paytexta cîhanê”, ev hezar sal in ji xwe re kirine war, star û serbajar. Di vê nivîsê de serpêhatiya du keçên kurd, Fatê û Emîneya parsek cîh girtiye ku berî sedsalî li “paytexta padîşah” Stenbolê, li pey belengaziya xwe ketine.


Dîplomat û nivîskarê swêdî Birger Mörner (1867-1930) dema di destpêka sedsala 20an de li Stenbolê bûye, li wir wek dîplomat kar kiriye, ew her wisa jî li wir rastî kurdên Stenbolê hatiye û di hin berhemên xwe de qala wan dike. Yek ji wan nivîsên Birger Mörner ku bala mirovan gelek dikşîne, serpêhatiya wan herdu keçên kurd



Nivîskar Birger Mörner.

e ku me li jêr wergerandiye zimanê kurdî. Ew pirtûka Birger Mörner ku vê serpêhatiyê tê de cîh girtiye, di sala 1906an de bi navê “Di bin hîlalê de” (Under Halfmånen) hatiye weşandin.¹ Pirtûk zêdetir cîh dide dîtîn, bîranîna û serpêhatiyên nivîskar ên Stenbolê. Ew di salên 1902-1903an li Stenbolê maye. Di pirtûkê de her her wisa jî

¹ Birger Mörner, Under Halfmånen, 1906, rûp.38-39.



Li aliyê çepê herdu keçên kurd, Fatê û Emîne li Stenbolê tên xuyan.
(Ev nîgar ji çapa di pirtûka nivîskar a sala 1915an de çih girtiye.)

em hin tîpên kurd dibînin ku rengekî pirçandiya Stenbola kevn pêk dianîn. Ji der serpêhatiya Fatê û Emîneyê, di vê pirtûkê de nivîseke din jî heye ku qala govend û dansa barbirên (hemal) kurd dike ku wê demê li Stenbolê diman. Angorî Mörner dema dibû êvar, tarî dikete erdê, van barbirên kurd dest bi govenda xwe dikirin û wê ev govendan dişibande dansa katalonan a bi navê Zardanas. Birger Mörner dibêje ku barbirên kurd wisa xurt bûn, ev barên giran ku dikaribû piştê ga bişkêne, bi rehetî ji cîhekî dibirin cîhekî din.² Ev herdu serpêhatiyên ku di pirtûkê de çih girtine, ligel hin berhemên nivîskar ên din du caran wek pirtûk bi navine

cihê careke din hatine weşandin.³ Niha em mêze bikin, ka van herdu keçên kurd çima ji nivîskar “nefret” kirine: *“Du afrendeyên ku li paytexta Padîşah dimînin, min wek cenewaran dibînin û ev yek min xemgîn dike.*

Navê yekê Fatê, navê ya din Emîne ye; du keçên parsek ên kurd, çavxezalên xweşik û bi dengên wek xuşexuşa çavkaniyên gur. Herroj berî nîvro dema ez diçim navrojê, ew hertim li ber deriyê min disekinîn, rastiye bêjî disekinîn. Min li xwe datanî ku qet min ew nedîtine, lê belê ew hertim li pey min dihatin. Bi gotinên xweş bi zimanekî mirov tenedighîşt bexşîş dixwastin. Heryekê herroj çend qurîşên hûr ji min distendin û

³ Birger Mörner, Från Arafis irrfärder, 1915. Birger Mörner, Turkiska år och andra (ur mitt irrande liv), 1926.

² Birger Mörner, Under Halfmänen, rûp.79-80.

di dawiyê de êdî min tucar cesaret nedikir derkevîm kuçeyê bêyî ku pereyan hûr bikim. Bes niha ew tucar zêde ber derge nasekinin.

Berî hefteyekî carekê dema ez nêzikî van deran li kuçeyê piçûk derbas dibûm, min dît ku xortekî yunanî, hîşdeh yan jî bîst salî guhekî pisîkekê (pişik) girtiye bi xwe re dikîşîne. Ez bi şîva xwe kuçê derbas bûm wekî di derbarê vê kirina wî ya ne di cîh de şîretan lê bikim, bes dêvla ku pisîkê berde, wî pisîk girt avîte ser banê xanîyekî nêzik û revîya. Pisîka ku belkî jî berê birîndar bûbû, ji jor de

bêkontrol kete erdê û piştî xwe şikand. Her dinalî bêyî ku xwe hevekî bilivîne. Ji bo ku ew ji vî ezîyetî xelas bibe, min kevîrekî mezin li kuçê hilda û bi vî kevîrî serê wê (pisîk) perçe kir.

Hema wê demê min li paş xwe qîjîneke bi tirs û xofa mezin bîhist. Ez zivirîm û min Emîne dît. Wê dizîka ve ez pêkol (teqîb) kiribûm û niha ji tirsî dicirîfe, bi çavên xwe yên reş bi nefreteke nedîtî, li min mêze dikir. Wê nedît û fam nekir ka min bo çi ew pisîk kuşt.

Rojtira din min ew keçên parsek ên kurd, çavxezal, bi harmaniyên xwe yên şîn êdî li ber deriyê xwe nedît. Ji vî bûyerê vir de te digot ew wînda bûne.

Bes carina, dema ku ez diçim di-kanekê, tişekî wisa şîn qerepere, nezêlal li ber dêrî xuya dike. Ez dizvirim, ez hew zanim pistepista dengêkî tê “ps! ps!” Ew Fatê û Emîne ne, li wêderê sekinîne û tu dibêjî qey ew gazî pisîkekê dikin”.

Serpêhatiya van herdu keçên kurd, bi taybetî evîna Emîneyê ya heywanan (ajel, lawir) çawa em li jor jî dibînin derseke baş û hînkêr dide me xwendevanan.

Birger Mörner him bi tekst û him jî bi wêne jîyana Emîneyê baş dokumente kiriye. Tiştekî balkêş jî piştî gelek salan dema em li arşîva Birger Mörner mêze dikin, vê carê em rastî sûretekî Emîneyê jî tînin ku Birger Mörner berî sedsalî li Stenbolê kişandiye û paşê bi xwe re aniye Swêdê. Emîneya kurd em



Emîne—parseka kurd (Kurdisk tiggarflicka-Emine). Ev wêneyê Emîneyê iro li Swêdê di arşîva Birger Mörner de tê parastin.

dikarin bêjin ku bi temsîlî vê carê hatiye Swêdê û em wê li Swêdê dibînin! Wek hercar çawa wê li Stenbolê, Mörner teqîb kiriye, li Swêdê jî daye pey wî! Ev sûretê dîrokî di arşîvan de bi navê “Emîne -Parseka kurd: (Kurdisk tiggarflicka: Eminê) hatiye qeyd kirin.


Nivîskar dema ev pirtûka xwe di sala 1906an de weşandiye, her wisa ji gelek kesên navdar re jî şandiye. Di nav wan kesan de dîplomate kurd Şerîf Paşa û nivîskarê swêdî August Strindberg jî hebûne. Wê demê Şerîf Paşayê kurd jî li Stockholmê sefirê osmanî kar dikir. Em di arşîva Mörner de rastî nameyeke Şerîf Paşa ya bi terîxa 20/5 1906 tên ku Şerîf Paşa tê de spasiya xwe ji bo vê pirtûkê pêşkêşî Mörner dîke: “Min nameya we ya 17ê vê mehê wergirt li gel berhema



Karîkatûreki nivîskarê swêdî yê navdar August Strindberg.

pir balkêş ku we ji min re şand. Ez pir spasî we dikim bo hîsên sempatiyê ku hûn bi şewekî giştî ji bo welatê min di vê berhemê de diyar dikin”.⁴

Gelek nivîskarên swêdî yên navdar, hevalên Mörner bûne, nivîskarên wek Strindberg, Fröding û Heidenstam. Em ji nameyeke August Strindberg fêr dibin ku wî jî ev pirtûka Birger Mörner xwendiyê, spasiya xwe jê re şandiye: ”Spas ji bo pirtûka te; min ew bi kêfxweşîyeke mezin ve xwend, lê belê ew dikaribû hin dirêjtir bibûya!”⁵ Bi rêya vê nameyê em fêr dibin ku August Strindberg jî bi saya vê pirtûkê, nasiya xwe daye serpêhatiya van herdu



Nameya Şerîf Paşayê kurd a ku di sala 1906an de ji nivîskar Birger Mörner re şandiye.

⁴ Orjînalê vê nameya Şerîf Paşa di arşîva

Birger Mörner de tê parastin.

⁵ Strindberg's Brev XV, Bonniers, 1976, rûp.246.

keçên kurd. Birger Mörner yek ji wan hevalên here nêzik ên Strindbergî bûye û li ser wî pirtûkek jî nivîsiye.⁶

Birger Mörner jî bi xwe jî nivîskarekî navdar bûye, gelek pirtûk nivîsîne. Hin pirtûkên wî yên populer di van salan de pir hatine firotin. Birger Mörner her wisa jî wek hezkirî, dildar û berhevkarê pirtûkan hatiye nasîn. Ev bibliofiliya wî, jê re bingehe pirtûkxaneyêke mezin amade kiriye. Pirtûkxane û arşiveke dewlemend a Birger Mörner hebûye. Di pirtûkxaneya wî de qasî 7 hezar pirtûkên kevn û dûrîdest cîh girtine.⁷ Meziniya arşîva wî ji hezaran sûret, name û destnivîsan pêk tê. Birger Mörner bi xwe jî gelek dewlemend bûye, wek torin û arîstokratekî hatiye nasîn, qesreke wî ya bi navê Qesra Mauritzberg (Mauritzbergs Slott) hebûye. Birger Mörner di destpêka sedsala me de çend salan di vê qesrê de maye. Mörner gelek kesên navdar di vê qesrê de ezimandine. Niha jî di qatê yekem ê vê qesrê de odeyek heye ku bi navê Odeya Birger (Mörner-rummet) tê nasîn. Wî, ew romana xwe ya bi navê Bråvallahus di vê odeyê de nivîsiye û hema dîroka vê qesrê jî kiriye mijara romanê. Xwediyê vê qesrê yê berî 400 salan yekî bi navê

Mauritz Birgersson Grip (1565 - 1562) bûye. Ji ber vê yekê navê vê qesrê danîne Qesra Mauritzberg. Ev qesra dîrokî ku demekê wek qonaxêke çandî hatiye nasîn, îro wek hotêleke konferansan tê bi kar anîn.

Ji alîkî ve çîroka Fatê û Emîneyê, ji alîkî ve serpêhatiya nivîskar Birger Mörner, dîroka qesra wî, têkiliyên wî ligel Şerîf Paşayê kurd, nivîskarê navdar August Strindberg û kesên mayîn, babetên cihêreng piştî sedsalî di vê nivîsê de tên nik hev. Her wisa jî herdu paytextên navdar, Stenbol û Stockholm piştî salan be jî wek li vir xuya dibe bi saya serpêhatiya van herdu keçên kurd dest ji hev re li ba dikin û silavan ji hev re dibarînin. Piştî sedsalî be jî hemwelatîyên Emîneyê li Stocholmê wek li vir jî xuya dibe wê bi bîr tînin. Mînaka vê keça kurd, mînaka Emîneyê di dîroka jinên kurd de jî rûpelekî gelek bi şemal û bi biriqî pêk tîne. Emîne tu her bijî! Her wisa jî Fatê...

Ji van babet, cîh û deman her yek bi awayê xwe, di aliyê xwe de tiştêkî îfade dike, vê carê em xwe dispêrin çend gotinên swêdî yên gelek aforîzmatîk: “Her tişt xwediyê serpêhatîyêkê ye” yan jî “her tişt xwediyê dîrokekê ye” (Allt har en historia).

6 Birger Mörner, Den Strindberg jag kânt, Albert Bonniers Förlag. Stockholm 1924. Wî, her wisa jî berê pêşengiya pirtûkêke din jî kiriye ku li ser nivîskariya Strindbergî ye: En bok om Strindberg, 1894.

7 Björn Meidal, Birger Mörner, Svenskt biografiskt lexikon, band 26, 1989, rûp.344-349.

Tato (Kasim Çabuk)

Çîroka dilketina Tato

Berhevkar: Ali Ceran

Tato ji Kelhesenê ye ji 1955an de li gundê Tetera (Bogrudelik) li ba Heci Nuri wek şivan disekine.

Tato keriyê pêz ku li ber e, her roj dibe li kaniya gundê tetera avdide. Li ser kaniyê Tato keçîkekê dibîne û dilê xwe dikeviyê. Tato ji hevalê xwe Nazo dipirse ka ev keçîka kê ye. Nazo dibê navê wê Meryem e, ji goçmanên Bulgaristanê ne. Tato dilê xwe ji Nazo ra vedike ku ew aşîqê vê keçîkê bûye û divê Nazo dilketina Tato bigihîne Meryemê. Meryem dema dibihîze şaş dimîne û bi malbata xwe ve dilnakin dibên: Tato yî zewiciye naxwazin keçîka xwe bidin Tato. Tato herçiqas rîcaciyan dişîne jî malbata keçîkê naxwazin keçîka xwe bidin yekî kurd û bavê keçîkê ji bo ku xwe ji Tato xilas bike, keçîka xwe dide lawê gocmanekî ku li Bursayê dimîne. Dema Tato pê dihese ku soza Meryemê dane, bi hevalên xwe ve biryara Partiya Dildariyê didin û dibên: ev kesê ku aşîq be divê li ser dilketiya xwe kilamekê bêje û wê birevîne.

Dema Meryem pê dihese ku Tato bi rastî aşîqê wê bûye, ew jî naxwaze here li Bursayê mêr bike, xeberê ji Tato re dişîne ku Tato wê birevîne. Tato zaten bi hazir e û îcar ronîvrokê Meryemê bi araba hespan direvîne.

Bavê keçîkê tere li Cihanbeyliyê şikayeta Tato dike ku keçîka wî ya temenbiçûk bi zorê revandiyê. Esker radikin ser gundê Kelhesen, lê bîfêyde, nikarin Tato û Meryemê peyda bikin. Di dawîya dawîn de bi rêya hevalê Tato Elîşêr xeberê dişînin ku ew dixwazin li hev werin. Herçiqas Meryem bi şik e jî, Tato Meryemê digirê tê bo lihevhatinê. Bavê Meryemê piştê dîsan dilekçeyekê dide sawciyê Cihanbeyliyê û Tato digirên davêjin hepsê. Tato du salan li hepsê dimîne. Meryemê jî îcar didin gocmanekî Istanbulê.

Tato ji hepsê derket bi şûnda vedigere gundê xwe û li dawet û di kombûna hevalên xwe de her vê kilama xwe ya dilketina Meryemê distirê...

Goçman

Digo meke meke Meyrik meke
Carê were qapiyê hepisxanê li ser min veke
Tu ya çavreş çav belekê
Îbrahîmî Kertelî nizane kî nanî xwe buxe
Diwê here lo lo Tato aqilî serî te yî seyrek e

Digo va mîratê gire gire
Jêlva hat Elşêrî Eşguriyê ber nifir e
Digo lo lo Tato were qelingê xwe bibire
Min go Elşêr nifira ku ez li te dikim
Înşallah ewladî nêr li ber serî te ne kur e

Digo meke meke goçman meke
Meke meke Meyrik meke
Tu ya çavreş a çav belek e
Carê were deriyê hepisxanê li ser min veke

Te nîkaha min bi xwe kîymîş kir
Te îfada paşîn pir yaxnîş kir
Te navê xwe yî şîrîn
Li Gonil Partiya me sîlmîş kir

Digo meke meke Meyrik meke
Carê were qapiyê hepisxanê li ser min veke
Tu ya çavreş çav belekê
Carê were deriyê mapusxanê li ser min veke

Digo te dev çepelê dev avkatê
Sebra dilê min dewom ke
Heta te got: Fat kîxzala min e
Ez dikşînim qeyreta Fatê
Min go Omo nifira ku li te dikim
Înşallah xoce nê ser te bi selewatê

Digo meke meke goçman meke
Tu ya çavreş a çav belekê
Carê were deriyê mapusxanê li ser min veke

LO BIRAO

Lo birao sazê xwe bigre were vira
Du kilama biwêm li ser derd û kula
Ki dengê xwe rê sazê te dim, bayin kim çi heye di dil da
Belkî dengê min here keçika di xewa şevê da

Ez nexwaş im mame li ber destê doxtora
Ev çito doxtor in, qe nizanin derdî dila
Min go were bira, sazê xwe bigirê were vira
Tenê sazê te dizane derdî dila

Min pišta xwe da dîwarê xestexanê
Zîyaretçiya dipirsim, dibê m xeberek tune li yarê
Diwên bîr bike ew yara bêbext
Xwe jê re meke erd û tac û text

Ustuyê me keştîye li ser mil û pîya
Kesek tuneye min derdê xwe têr têr bigotaya
Min go were birao, sazê xwe bigre were vira
Çarekî bigere di nav têlî sazê xwe da bi pênc tiliya.

Îbrahîm Korkmaz

GULÊ BÊDIL DA

Bilbil ketiya baxçê gula
Distirê li ser eşqa dila
Bilbil silav da gula mala
Gul jî revî dîsa bêdil da

Gul çilmisî ji vê dunê
Bilêbil herimî bi vê kulê
Tu ne gul bûya, ne ez bilbil
Xêrik nedît ber vî dilî

Gulê Gulê ziman reşê
Tu çima mira bûye hewesê
Ji xelkê ra pir dilxweşê
Min dihêle tim alî paşê
(nakarat)

Min navê te darxist li dîwara
Pirs dikim ji teyr û tûra
Xeberekê ji Gula min bînin
Ji tev bahê erd û ezmana
(nakarat)

Îbrahîm Korkmaz

BAFIROKA DILÊ XEŞÎM

bi saya hestên ciwanmêr
bêhêvîtiya şevên asîmana sayî
silav dikim
heyvê
jana xewnên min yên reşbelek
di bin perdeya kenê awirên xwe de
veşartî ye
her şev
balafira asîmana gêjok
li nav ewrên êşa sînga min
dernixûn dibe
ji axîna hinavên peritî
dilopên hêrsa demên têkçûyî
dibarin
mirovên çavsor
li şûna giyanê min yê qetiyayî
çîpên protez pê ve kirin
ava deryayê ji masiyên masîdanka dil
êvişandin
nalînên kezeba min
di laşê striyan re çûn xwarê
qêrîna pêûsa lal
zikê dîwarên zîndana odeya min
didirîne
stargeha xeyalên rengîn
li suîqesteke serserî
tarûmar bû
min her roj
ji xelk û alemê re bafirok çêkirin
lê bafiroka dilê min yê xeşîm
qet nefirî

Xizan Şîlan

2009-11-18

Stockholm

Deng nekir

Mem Xelikan

Ji gundekî kurd, gundekî cîranan hatibû, Heso... Li gundê wî, aş (Değirmen) tunebû. Ji bo ku genimê xwe bihêre û ardê xwe dagire li wira bû. Gundên kurdan, yên li doralîyên wî gundî, tirkan dihatin li aşê wî gundî genimê xwe dihêran û dikirin ard.

Heso jî ji bo wî karî li wir bû. Dora xwe dipa û di bin sîya areba xwe de vêdisîya. Lingên xwe dirêj kirî, dixwast hilma xwe bigire. Carcaran xewê dida ser û xelmaş dibû. Çavên xwe vedikirin û digirtin. Bi dengê Kazim hate xwe û bi xwe hêsîya. Lingên xwe kişandin, xwe berhev kir û di cihê xwe de rûnişt.

Kazim: – Xalo, merheba.

Heso: – Merheba.

Kazim: – Bi xêr hatî, çi dikî xalo?

Heso: – Tu sax bî, ez baş im tu jî bi xêr hatî, kerem ke.

Kazim: – Welle ez jî baş im.

Heso: – Xwarzî, min tu nas nekirî tu ji vî gundî yî?

Kazim: – Erê, xalo, ez ji vî gundî me. Min bibaxşîne min ji dûrde li te mês kir. Xûna min kelîya ser te. Ji bo wê hatim ba te. Ger tu nerehet nebî dixwazim li cem te rûnim.

Heso: Na, xwarzî çima nerehetî bibim? Ez dora xwe ya aş dipê. Heval jî tunene, min xwe dirêj kir ku wext derbas bibe.

Kazim xwe da kêleka Heso û li sîya areba Heso rûnişt.

Kazim: – Xalo, te pirs kir ez ji vî gundî me. Min li jor jî got, erê ji vî gundî me. Lê ez xwarzîyê we, xwarzîyê kurda me.

Heso: – Na lo, ez ji vî gundî pirs meriyan nas dikim. Tu lawê kê yî? Çima, te nas nakime.

Kazim: – Xalo, tu bavê min nas dikî nakî nizamim, dayîka min kurd e. Ji bo wesîyata wê ya li ber mirinê ez li vira me.

Heso: – Hella hella, li gundekî tirk, xwarzîyekî kurdan. Yê ez dizanim, li vî gundî tu keçikên kurdan tunene. Navê dayîka te çi ye? Ji kîjan gundî kurda yê?

Kazim: – Dayîka min xelikî ye. Qerecedax. Xalo, tu ji kîjan gundî yî?

Heso: – Na lo, ez jî xelikî me.

Kazim: – Pêêê, weng e, tu xalê min î heq î. Xalo, dayika min, li ber mirinê ji min re got: Ez, kurd im. Tu jî xwarzîyê

wana yî. Dizanim her payîzekê ji gundên kurdan ji xalanên min meri tên vira. Ji bo aşê xwe lêkin. Ez jî têm dûre ji dûr de wana sêr dikim. Xûna min dikele ser wana. Huro jî ji bo wê hatim. Rastî xalekî xwe, rastî te hatim.

Heso: – Xwarzî, her dihere tu dilê min dikî meraq û şikê.

Kazim: – Na, xalo, meqseda min tenê, wesîyata dayîka xwe bi cih bînim li cem te me. Meqseda min, ne te bêşînim.

Heso: – Rind e xwarzî, lê te hê ne navê dayîka xwe kat kir, ne jî xwe da nasandin.

Kazim: – Xalo, te qebûl kir ez dixwazim te bikim mêvan. Em herin mala min ez ê xwe jî bidim nasandin, dayîka xwe jî. Lê berê dixwazim, wesîyeta dayîka xwe bi cih bînim. Tim digot: “Lawê min, ez kurd im tu jî xwarzîyê wana yî. Însanetî, dostanî, biratî li cem wana heye. Ez li cem malbateke kurd mezin bûm. Huro li vî gundî me. Tu jî dizanî gundekî tirkan e. Gundê bavanên te”.

Heso: – Xwarzî, te dilê min kire meraqê. Ez ê bi şertekê werim mala te. Tu ê hekata dayîka xwe ji min re kat bikî. Ka ew keça xelikî yê, yekî wek te di nav gundekî tirkan de mezin kirî, kî ye? Çima ez nas nakime. Ez û gundîyên me pîr daran li vî gundî ne. Min pîr meraq kir.

Kazim: – Na, xalo, hûn dayîka min nas nakin. Ji bo ku wê qe deng nekir.

Bi ser wê axaftinê de xal û xwarzî ketin rê û çûn mala Kazim.

Dû xêrhatin û xwarina nîvro ya ku bermalîya Kazim dayî wana:

Heso: – Xwarzî, dibe ku dora min a aş derbas be. Ez ji bo guhdarîya hekata dayîka te bikim hatim vira.

Kazim: – Tu bi mafî. Lê ez xwe giran dikim ku bûka te çay ji bo te dayî ser agir bîne.

Kazim mês kir Heso eceleya xwe heye dest bi hekata dayîka xwe kir.

Xalo serê te neyêşînim nizanim çend salan ber vê dapîr û bapîrên min, Ji Rojhilat hatine vira. Hatine li Xelîkan bi cî û war bûyîne. Vana gotinên min e, yên ku min ji dayîka xwe bihîstine. Çend salan li Xelîkan li gundê we dijîn nizanim. Ji malbateke Xelîkan re xizmetîyê dikin. Lê li gor gotina dayîka min, ew bavê xwe hê sê salî ye, dayîka xwe jî pênc salî ye winda dike.

Xalo ya tu bizanî: dapîr û bapîrên min, dema ku dayîka min li pênc salîya xwe ye diherin ser rehmeta Xwedê. Ew malbata Xelîkan, dayîka min wek keçek xwe dihesibînin. Xwedîyê lê dikin û wê mezin dikin. Ez ji bo ku ecelaya te heye naxwazim şorê dirêj bikim û serê te bêşînim.

Wext derbas dibe. Dayîka min hefdeh heyjdeh salî dibe. Berzewac e.

Ew malbata xelikî dayîka min didin şivanê xwe yî tirk, li wî mar dikin. Ji bo wê jî ez lawê vî gundî tirk im. Dayîka min, tirkî nedizanî. Ne bi bavê min re, ne bi cîranan re, ji min bêtir bi kesekî re deng nekir. Bi zimanê xwe, bi kurdî bi min şa dibû. Ez didam ser junîyên xwe, bi kurdî ji min re lorik digotin û ez bi çîrokên kurdî dikirim xewê. Van peyvên kurdî ku ez dizanim û bi wan bi te re diaxîfim, yên wê rehmetyê ne ku bi ber min xistine û ez hîn kirime.

Heso: – Xwarzî, her dihere tu dilê min zîz dikî. Tu dixwazî min bi girî bikî? Te ez anîm mala xwe?

Kazim: – Na, na... Xalo tu meqseda min a weng tune.

Lê dayîka min, li ber mirîna xwe du şîret li min kirin. Got: "Lawê min, xalanên te kurd in. Her ku te ew li kêderê dîtî, xwe li wana bi xwedî ke."

Yek jî got: "Lawê min, ji bo ku ji kurdîyê bêtir min tu ziman nedizanî, min ji heyjêdeh salîyê vir de li vî gundî ji te bêtir qet bi kesekî re deng nekir. De bi xatirê te..." got û çû ser rehma Xwedê.

– Xalo, dilê min bi wê diêşe.

A, niha min tu bi rê kirî şuva ez ê herime ser gora wê. Ji re bêjime: Min huro bi ser wesîyata te de xalekî xwe kire mêvan. Xalo, nizanim dayîka min bigirî nizanim şa bibe.

WERE

Were

Agirekî bidim te

Vî bajarî bişewitîne

Bajarî asîman tarî

Kolanên wî xwîn e

Were tu bişewitîne

Bidengîya merivan

Tuneyî ya dost û yaran

Ji dest nezanan

Bajar mirî bêtam e jîyan

Yareke bejnzirav û çeleng

Bijang dirêj bi boyaxa

Kulîlkên Agirî kildayî

Sorgulîyên xwe ser bejnê de berdayî

Di vî bajarî de tune

Were

Agirekî bidim te

Vî bajarî jor û jêr de bişewitîne

Bajarî ku kesekî min tê tune.

Mem Xelîkan

Mîr û cotyar

Rokê Mîr xwe tebdîl kir (tebdîl- î qiyafet) û derket rê. Pir çû, hindik çû, cotyarek dît ku erdê diçînî. Dawestî got:

– Çaxa te bi xêr cotyaro.

Cotyar got:

– Bi xêr hatî.

Mîr got:

– Tu çi diçînî.

Cotyar got:

– Dema ku birrizê tu yê bibînî...

Mîr têgeheşt ku kalê cotyar bi aqil e, xast wî îmtîhan bike û ev pirsana avetin bêr cotyar:

– Cotyaro, çima tu derengî diçînî? (çandin, pêwerkirin, reşandin).

Cotyar got:

– Min helli(zu) çand lê vernî (derengî) hat.

Mîr got:

– Ji dûr û nezik tu çawanî?

Cotyar got:

– Ji dûrî, ez hatimê nezikî.

Mîr got:

– Ji dîwanê tu çawayî?

Cotyar got:

– Kete kete man.

Mîr got:

– Ji Naâmê (bi fransîzî: autruche), çend hêk dikevin?

Cotyar got:

– 12 (dehûdu, donzdeh) hêk dikevin.

Mîr got:

– Çend ji vana sax dimen û çend ji vana pûç dimen?

Cotyar got:

– Eger du jê sax bin, hemmî sax in, aka, dudu jê pûç bin, hemmî pûç in.

Lêk dane we (bi fransî Commentaire)

– Çima tu dereng diçînî: Yanî li şûna xwe çima tu lawekî xwe naşînî cot, bi vê kalbûna xwe tu xwe diwestinî...

– Min helli çand le vernî hat. Yanî lawên min hebû, le mirin, ê ku heyî jî, hîn gede ye nikare alîkarîya min bike.

– Ji dûr û nezik tu çawanî: di virda Mîr dixwaze bar û doxa cotyar bizane.

– Ji dûrî ez hatime nezikî: yanî, di xortbûna xwe da, tiştên ku min dûr va didî, nuha tenê nezikî dibînim.

– Ji dîwanê tu çawayî: Yanî di devê wî da çend didan mane.

– Kete kete man: Yanî hîn çend didanên wî hene.

– Ji Naâme çend hêk dikevin: Yanî di salekê da çend mehe hene?

– Çend ji vana sax dimen û çend ji vana pûç dimen? Yanî kîjan mehên ji bo cotyar baş in.

– Eger dudu sax bin hemî sax in: di virda cotyar qelê meha adarê û nîsanê dikîye. Yanî van mehan da baran bibare, bermayî û qezenç pir dibe. Hemû mehên dîn baş derbas dibin. Lê van du mehan da baran nebare, hemû mehên dîn pûç in û qezenç nabe.

Bi bersivên cotyar, Mîr, matmayî ma.

Jordan
2621(2010)

Pêşbirka ceribandinê ya navnetewî:

DAHATÛYÊ JI RABIRDÛYÊ XELAS BIKÛN

RABIRDÛYÊ JI DAHATÛYÊ XELAS BIKÛN

Nuh Ateş

Li ser pirsên li jor, di sala 1998 an da pêşbirkeke navnetewî ya ceribandinê hatibû li-darxistin. Pêşbirke ji her kesî ra vekirî bû. Lê zimanê beşdarbûnê sînorkirî bû. Beşdarbûn tenê bi çend zimanan, wekî inglîzî, frensî, çînî, hîndî, rusî, Elmanî mumkun bû. Ez jî bi zimanê elmanî beşdarî vê pêşbirkê bûm. Lê berhema min nekete tu dereceyan û heta niha li tu deran nehate weşandin. Ew wê roja, gava ku min li mal refan kîteba durist dikir, bi ber çavên min ket. Bi vê minesebetê, fikra wergerandin û weşandinê kete sere min. Ez pir li ser nivîsandina wê xebitî bûm û lewma dilê min pê razî nebû ku ew di-arê here. Min xwazt ku wê wergerînim kurmancî ji bo weşandina di kovara Bîrnebûnê da. Min beşa yekem xelas kir û li ber we ye. Mijar û navaroka wê hîn jî aktuel in. Tenê gerek e ku xwendevan ji bîr nekin ku ev nivîs di sedsala bîstan ya rabirdî da hatiyê nivîsîn û dema xwendinê vê li ber çavan bigrin. Nivîs ji bo weşandina di çarçevaya kovarê da dirêj e. Ji ber vê ew a di du hejmarên kovarê da bê weşandin.

- I -

Ku meriv bi ser ra çêv lê bigerîne, pirsra pêşbirkê berbi her aliyekî biguman xwe vekirî dinimîne. Bi vî halî meriv dikane wê bişibîne xaçerêzeke dijwar. Lê bi lê-nihêrîneke ji nêzik da ew heyecanê pêy-da dike û balê dikşîne ser xwe. Ew giranbarekî dixê stûyê beşdarên pêşbirka ceribandinê ya navnetewî.

Rabirdû û dahatû bi giştî navlêkirinên ku eleqayê xwe bi dem û dorê va hene. Li gorê teorîya relatîvî dem û dor

bihev va bêveqetî girêdayî ne. Bi zimanê fizîkê ew wekî "dordem" jî tên binavkirin.

Dem dirêjehîyeke ku têye pîvandîne. Ew wekî mesefayê ku tîrêj di sanîyeke da paş va dihêle tê salixdan.

Em rûdan û pêkhatiyên qewimî wekî rabirdû û yên li pêy wan jî wekî dahatû binav dikin. Rabirdû dema ku hatiyê xerckirin û dahatû jî heyîya li ser hesabê demê ye.

Dordem dikane ji bo pevajojyên pekhatiyên pir piçûk, wekî bistek ji

sanîyekê yan jî bi milyaran tîrêjsal dirêj bibe. Wekî tê zanîn, dordemên hana bi têgihêştîya merivên ji rêzê nikanin bên tesewurkirin.

Eger em berbi rabirdûya dûr derkevin rêwîtiyeke xeyalî, em ê kurtedemekê şûn da rêya xwe şaş bikin û bilez berê xwe bidin vegehrînê.

Em pirtir bêçare dimên, gava ku em berê xwe didin lêgerînên li ser destpêka evalusyona merivan û gedûnîyê û dahatûyên wan.

Di derheqa dordem û pêvajoya pêkhatiyên han da ji bersivan pirtir pirsên me hene. Pirsên weha ne ku pisporên bijartî jî nikanin bersiva wan bidin û ew li ser wan di navxwe da û bi teologên ji olên jihev cihê va ji kevnedeman da li hev nayên. Lihevnehatiyeke hemdemî ye û şair û bîrewerê şerqê Omar Xeyam qasî 900 salî berî vê dîtina xwe li ser anîye ziman: "Yekî ol û bawerîya olî da ber xwe. Yekî din da dûv zanyarî û heşgihêştîyê. Ji nav şevreşîyê dengêk bilind bû: Bêhayno! Rêya rast ne ew e û ne jî ev e."

Lê pêkhatiyên ku di demeke nêzik da qewimîne ne wer in. Derheqa wan da em li ser xwe ne û dikanin li ser wan bidin û bîstînin û derheqa wan da ji xwe ra dîtinekê pêda bikin.

Rabirdû û dahatû bi ser hev va ne û bi pir cureyan pît bihev va girêdayî ne.

Huro nuhdem e, doh rabirdû û sibe jî dahatû ye. Bi çavî doh huro dahatû ye.

Pir berhemên ku em huro bikar tînin, ji firçeyê bigre hetanî mûkêşê, ji kelêm hetanî nahtarê gîşt li rabirdûyê hatine çêkirin. Ramanên me yên huro, li ser serbestî, lîberalîzm, sosyalîzm, mîlet û mîletperestîyê mîrasên ji sed-sala rabirdû ne. Ol û kevneşopîyên bi hezaran sal jî wer in. Xwezayî, dunya, gerdûnî û em însan jî di rabirdûyê da pêda bûne. Nêzikî 6 milyar însanên li ser herde heroj berbi dahatûyê dimeşin û wê dikan rabirdû.

Rabirdû û dahatû li ser zemînê ku em wekî nuhdem binav dikan digihên hev. Di nuhdemê da rabirdû tê çêkirin û dahatû tê hunandin. Nuhdemî di navbera rabirdû û dahatûyê da xetekî tenik e. Ew wan jihev naqetîne, berwajî di hev girê dide.

Meriv dikane dahatû û rabirdûyê wekî rêwîtiyeke dirêj û bêveger tesewur bike. Encax derfet heye ku meriv rêwîtiya ku paş va hatiye hîştin, sewa ku rêwîti xwaştir hêsantir bê berdewamkirin, bi nihêrîneke rexnedar di ber çavan ra derbas bike.

Ji bo pirsê pêşbirkê bersiveke hêsan û zelal tune. Li ser pirsê pêşî ya pêşbirkê bi dîtina min zêdetir girek ew e: Ma ji serhatiyên rabirdûyê çi neye serê dahatûyê? Ji bo lêgerîna bersiva vê pirsê

gerek e ku meriv li ser pareke sînorkirî ji rabirdûyê daweste û lê hur bibe.

Sedsala Rûdanên Bijartî

Qal ya sedsala bîstan ya ku berbi dawîyê dilive ye. Rewa ye ku ew wekî sedsala rûdanên bijartî bê binavkirin. Gava meriv bervepaş lê binihêre, gerek e meriv miqet bike, da ku hundurê xwe lihev nekeve. Sedsaleke pêkhatîyên teknîk û îcadên bilez. Serdemeke nû ya makîne, dezgeh û hacetên ku di xanî, karxane, aşxane û gerajên me da bicîh bûne. Ji bo ku pê kar û jîyana me siviktir bibe û em di nav xwaşhalîyê da bijîn.

Sewa vê, tê xwaztin ku ew bèn kirîn û parêztin. Ew ji me betalkirin, tamîrkirin û pakkirinê dipên, wekî ku em xizmetkarê wan bin. Sewa van gîştkan jî bedelek, pere û wext lazim e û ev jî li me dibe barekî. Yê ne betal gune ye, ew sewa qezenca bo dewara "koma makînan" kar dike û stresa karkirinê jî dide ser talîyên xwe.

Bi dehan dezgeh û hacet me û dorberê me diguhêrin. Ew jîyaneke bilez didin ber me û tê da, ji yên ku dil û hundurê xwe jar in, hen li rê dimên.

Ragihandina navbera merivan her ku dihere bi rêya hacet û dezgehan dibe. Ji bo dengkirina rûbirû wext tune. Şahgotina "serdema destelefonê" ev e: "wexta min tune!"

Em bûne makînekêş. Ji meqamtomafilê fereqet kirin ne mumkun e. Meşandina karûbarên desthilatdarîyê û bicîanîna hevdîtinên sîyasî yên endamên hukumet û parlamenê bê meqamtomefil nayên bişîyakirin. Bi şev û bi ro ew li ser kar e. Meqamtomefil geh li vir û geh li wir, bê wê tû dewar nabe. Demokrsîya me ya huro xweîdareyeke ku ji meqamtomefilê bi gihan e. Meriv dikane wê wekî "demokrasîya meqamtomefilê" binav bike.

Ji hembêza vê sedsalîyê du şerên cîhanî derketin. Yê duduya bi hêza xwe ya kujtin û wêrankirinê bêartir bû. Lê paşê? Paşê aşti çêbû, pir kesên wer bibên. Dûv ra, ji şerê cîhanê yê duduyan vir da, hetanî sala 1997 186 şerên herêmî li pir alîyê dunyayê pêk hatin. Di encamê da, potensiyala wan ya wêrankirinê di ser ya şerê cîhanê yê duduyan ra bû. Li gorê hesabkirina "Hevkarîya Lekoîyê ya Sedemên Şer" (AKUF), parhejmara qurbanên sîvil yên şerê cîhanê yê duduyan jî sedî 50- 60 û ya şerên herêmî ji sedî 80 - 90 bû.

Ew sedasala dînbûnîyê bû. Tê da, di saye ji rêderxistina hizra merivatîyê çêkirin û bikaranîya sîlehên atomî pêk hat. Ew bû sedsala sîlehên atomî, kîmyevî û bîyologî yên ku jîyanê tehdît dikin û li pir karxaneyên li her derê dunyayê tèn çêkirin, firotin û bikaranîn. Bi hezaran

cihêkar ji çêkirina wan sîlehên merkûj û ji wana jî bi milyonan însan bi gihan in. Feqeke şêtanî ye. Ew cihêkar feq in, "reşqulên" senayîya silehan in. Jîyanekê ava û yekê jî wêran dikin.

Şerên sedsala bîstan yên bi awayekî din jî hene. Zordariya li mektew û cadedeyên dunyayê. Ê şerên piçûk yên di bin banê xaniyên li ser rûyê erdê yên ku di nava malbatan, di navbera jin û mêran û cîranan da roj bi roj bi milyon çêşidî pêk tên. Sedsala bîstan hosteyê şeran bû. Ew sedsala şoreşan yên piçûk û mezin bû. Şoreşên ku dunya pê bûbû du blokan. Şoreşa sosyalîst ya oktobê li Rusiyayê (1917) pêşî lê vekir. Şoreşên dijî faşîzmê li rojhelata Ewropa û li Balkanya dan pêy. Di salên 60 û 70î da şoreşên rizgarîya ji dagirkeriyê bûn xelqeya sisiyan di vê pêvajoyê da.

Qor bi qor şoreşên bi sîleh û bi xwîn yên ku di sêrî da bo îdealên mezin destpê kiribûn, pir neçû ji rêderketin û ji sehneyê vekîşîyan.

Çi bi piçûk û çi mezin, çi heq û çi neheq, şer û şoreşên vî sedsalî êş, wêranî û tevlihevîyên mezin ji paş xwe va hîştin. Meriv dikane hêvî bike ku ew neyên serê sedsala bîstûyekan.

Sedsala bîstan ya ketina sosyalîzmê, xênetîya li îdealên merivatîyê, qêwetkarîyê, şikestina hêvî û payîyên bi milyonan însane ye.

Ew sedsala sermîyanê ye. Gava ku dunya ji du blokan peyda bû û navê komunîstîyê wekî xeyalet li dunyayê dihate heldan, tevgera sermîyanê sînorkirî bû. Ji xofa ji ber tekîpkirinê, wê nişanên împotentîyê didan der. Gava ku tevgera sosyalîstîyê ji hev da ket, ew hate xwe û destpê "seferên kedxwarîyê" berbi rojhelata Ewropayê ya ku hetanî hîngê jê ra dergirtîbû, kir. Ji hîngê vir da "karorgazma" wê gihêstîyê dereceye herî bilind.

Lê rûyên vê "şadhalîyê" yên tarî jî hene. Li pir welatên dunyayê sermîyan bi rûyê xwe yê xerawkar û kedxwar derdikeve pêş. Sîstema wê ya ku bi naznavê wekî "sebest", "sosyal", û "lîberal" tê binavkirin li welatên pêşketî jî xetimîye. Li wan deran bazara aborîya lîberal ji mêla peydakirina cihêkar va bêçare ye û nikane cihêkarên nû peyda bike. Ew ê mîna çoleke bê waha miçîqîye. Halbuku ew ê hetanî çend salan berî vê li Elmanyayê wekî navandekê balkêşandî bû. Beri gîştan hêzên wê yên magnetîk bûne sedema helweşîna dîwarê Berlînê.

Cihêkarên nû tenê li beşê wekî ticereta esrarê, perên reş û karên krîmînel yên ku li derî sînorê legalîyê ne tên peydakirin. Pornografî û canfiroştî yên ku xizmetên sektora bin doxinê pêşkêş dikin jî cihêkarên nû peyda dikin.

Li hemberî vê, eger meriv bixwaze

nimuneyekê bide, firmayên mezin yê tomefilan li gorê rekorqezenca xwe tu cihêkarên nû pêşkêş nakin. Berewajî, ew bûne kûjerê cihêkar. Li vir tiştê ecêb ew e ku bi ser da, li ba xelkê prestîja wan di ser ya branjên ku cihêkaran peyda dikin ra ye.

Li ser herdê bi mîlyonan meriv, tenê li Ewropayê hejdeh mîlyon li cihêkar digerin. Her kesek nikane teve lîstîka komeleya borseyê bibe. Ji wan ra, wekî betalên Frensayê, ji xêyrî derketina meydan û cadeyan tû rêyê din tune.

Sedsala xizmet û îcadên tebrûskî yên di warê hêkîmî û dermankirîyê da. Lê dîsa jî em ê ji ber nexwaşîyên mîna şêrpence û aîdsê neçar in. Heta tuberkuloza ku ji ortê rabûyî tê hesibandin ji nûva li Ewropayê vegeirîyaye. Şanparêzî bi destê heba "ducanîbir" hat. Rast e, wekî navê wê jî dide der, ew ne "ducanîhez" e. Lê wê tiştên erênî jî pêk anîn. Di saye wê da, rê li ber serbestîya jinê û xelasîya seksê vebû. Wê dawî li hukumranîya Vatîkanê ya li ser zikê jînê û monopola wê ya li ser zayînê li hen alîyê dunyayê anî. Ew li pir derên din jî derdikeve pêş. Di pêy kêmkirina merivan bi destê şerê cîhanê yê duduyan, ew jî bû yeksebeba kêmbûn û kalûpîrbûnîya nifusa Ewropayê.

Serê salên 60 î pir welatên Ewropayê ji ber kêmbûna karkerên cîwan neçar

mabûn. Ji ber vê, wan bange karkerên xerîb kirin û va wekî rêlêkirin dîtîn. Banga xwaztina karkerên xerîb li her dere dunyayê belav bûbû, di ber giştikan jî li dorberê Deryaya Sipî. Wekî dengvedana ku dibe sebeba berfendeyeke li serhev, wê rê li ber pevajoja koçberîyekê vekir ya ku hetanî huro didome û neye sekinandin xûya dike.

Di serî da, wekî ku di destpêkê da li Elmanyayê dihatin binavkirin, "mîvan-karker" hatin. Dûv ra wan kurûkulfetên xwe anîn. Multecî û stargeran jî dan pêy wan.

Niha jî pir welatên Ewropayê, di ber giştan Elmanya, ji ber "pîrbûna koçberan" eciz e. Yanê çare niha bûye girek. Tiştê ku di serî da wekî çare xuya dikir, niha bûye "girêka xerib".

Hukumetên Ewropayê li serhev tedbîran heldigirin ku pê pêşî li "zêdebûna xerîban" bigrin. Ji bo vê, bi peymanê Şengenê diwarek di dorûpaş Ewropayê ra danan, tê bibêji êrişekê li ber dêrî ye. Tişteki paradoks e, ji hêlekê da qala sînorên vekirî û globalîzmê ye û ji hêla din da stargeh tên avakirin.

Sedsala bîstan ya koçberîya gelan, revîn û qewtandinê ye. Tevgerîya koçberî û revînê dê di sedsala pêş me da berbi Ewropayê jî dom bike. Ew a rûyê Ewropayê biguhêre. Ewropaya hezarsalîya dahatû dê bibe kontîneteke "pirni-

jad" yan "çêrmreş", wer tehmîn dike nivîskarê îtalî Umberto Eco di gotarên xwe yên bi navê "Nivîsên Ehlakî" da.

Revîtî û koçbertî her dem hebûn. Her çiqas cihûwarên ku koçber jê dertên û cihê ku ew berbi dikişin bên guhêrtin ji, tiştêkî wan wek hev e. Revok û koçber hewl didin ku xwe bigihînin welat yan kontînentêke ku tê da aşî, aramî, azadî, parêztî û xwaşhalî heye. Ji ber vê ye ku pir ji wan li derîyê Ewropayê dixin û bi vê jî dîyar dikin ku ew dixwazin di nav aşî û xwaşhalî da û naxwazin di nav xizanî û nearemîyê da bijîn. Bi rev û koçberîya xwe pir meriv dixwazin rabirdûya xwe ya travmatîg ji paş xwe va cihbihîlin û destpê jîyaneke nû bikin. Sebeba pir girekan ne va xwazteka ye. Neheqîya li welatên wan, ferqîya navbera bakûr û başûr, rojhelat û rojava ye sebeb.

Sedsala bîstan sedsala dewlemendan, têrûtijîyan, xizan û birçîyan bû. Lûtîkeya xwedîkirinê (1996) aşkere kiribû ku di salên 1990/92an da 841 mîlyon meriv li 5 herêman (Afrîkaya Jêr Seherayê, Rojhelata Navîn û Afrîka Bakûr, Asîya Rojava û Asîya Başûr, Amerîka Latîn û Pasîfik) kêmxwedîkirî ye. Û va jî li dunyake ku di ser dêv ra dirêje da.

Di eynê demê da hejmara xizanên rêqûrût 1,3 mîlyar bû. Kêmxwedîkirî û birçîtî encamên xizanîyê ne. Berewajî

ku pir kes bawer dikin, binyad ne kêmayîya tiştên xwarinê yan jî pîrbûna meriva ye, di ber her tiştî sebeb têkîliyên sosyal, aborî û sîyasî ne.

Xizanî pir caran dibe sebeba birçîtîyê û birçîtî jî tê meneya mirineke giran û tijî cefa. Meriv ji avûrûyê birçîtîyê da serxweyî û merivatîya xwe ji dest dide. Ew êdî ne li serxwe ye. "Ew kanîna xwe ya fikirinê wenda dike" wer tespît kiriye nivîskarê englîz, Georg Orwell di encama eksperîmentêke li ser birçîtîyê da. Yê ku birçîtîyê dikşîne ne dikane rabirdûyê bibîrbîne û ne jî dikane teve hunandina dahatûyê bibe. Ma em yên ku birçîtîyê nas nakin di derheqa wê da çi dizanin? "Zikê têr hay ji yê birçî naye" wer dibê gotineke pêşîya bi kurdî.

Bi mîlyonan meriv li ser dunyayê bi destê birçîtîyê dimirin. "Lîstikeke mirinîyê" ya ku li ser sehnaya dunyayê her saet, her roj û her sal dubare dibe ye. Meriv dixwaze bibê, heq e ku zûva da ûjdana "Civata Cîhanê ya Şareza" bilerizîya! Lê na, Civata Cîhanê rê dide vê. Şûna ku sebebên vê xerawîyê ji ortê rake, ew xwe bi sinîyek riz ya ku daye ber devê birçîyan aşt dike. Sed sala bê ûjdanîyê ye!

Nabe ku meriv guh pê destekvtî û kifşên zanyarî yên sed sala bîstan va neke. Zanyarî beşeke pircûre ye û tê da komêk zanîyarên têrgezenc yên ku xelk geh

bi çavêkî piçûk geh jî bi çavêkî mezin lê mêz dike, kar dike. Ew li ser rabirdû û dahatûyê jî berhemên tijî zanîstî yan jî şaşzanîstî diafrînin. Berhemên zanyariyê weha yên ku pir caran ji aliyê navarok û zimên da bi têgihêştîya cîhanê ya nivînî nayan fehmkirin û hewceyê wergerandinê ne.

Rast e, ev ne wezîfeyê sivik e. Ji bo ku meriv bigihê zanîstî û kifşên nû bi salan lêkolandin, lêgerîn, pîvandîn û hesabkirin divê û wext dixwaze. Henan ji bo vê rêyên dîrûdirêj qat kiriye û li galaksiyên pir li dûrîyê çavdêrî kiriye, da ku me di derheqa nişedên wan da hayadar bikin.

Di çaryeka vê sedsalê da fîzîkzanê Ûris, Aleksander Friedmann jê bi guman bûye ku dîrîtî yan nêzîktîya navbera galaksiyên hevçiran da berî deh û bîst mîlyar salan sifir bûye. Gerdûn li wê demê di zikhev da, pêt li serhev bûye. Va sifirdema ya ku wekî kevneteqîn tê binavkirin bû destpêka dema me ya huro. Berî kevneteqînê dem tune ye û ger hebûya, hîngê gerek e ew bervepash bûya. Va jî li gorê dîtina zanyaran bê mene ye.

Di vê beşê da kifşeke din ya dahiyane di sala 1929 an da ji aliyê hemwelatiye Emerîka, Edwin Hubble da hatibû kirin. Hubble berî vê, hebûna galaksiyên din kifş kiribû. Huro em jî hebûna zêdeyî

sedmîlyar galaksî hayadar in. Hubble di encama hesabkirin û pîvandînan pir kompleks da dîyar kiribû ku galaksiyên pir li dûrîyê, her ku dihere ji me bi dûr dikevin. Û yên ji me dûrtir bi leztir bi dûr dikevin. Ew di saye vê tespîtê da gihêştîyê wê fikrê ku gerdûn berfireh dibe û dirêjîya di navbera galaksiyan da jî her ku dihere dike ser xwe.

Dibe yan kîngê dibe ku ew berfirehbûna ya ku zêdeyî deh mîlyar salan dom dike bigihê helweşînekê, kes pê nizane. Eger wer bibe, hîngê ew dê bi ya pisporan ji deh mîlyar salan bi şûn da pêk bê. Yanê têr wext heye ji bo barkirina galaksiyên din, eger di ber wê "qezayek" li asîmanê gerdûnê pêk neye û em hetanî hîngê mîna ya huro bimên.

Van qanûnên gerdûnê yên ku li wir hatine salixdan dikanin ji bo merivan jî derbaz bibin. Çunkî meriv bixwe jî pareke piçûktir ji gerdûnê ye. Erêbûna vê, meriv dikane bi çavdêrîya li pevajoya merivçêbûnê ya ku ez dixwazim bi awayekî ne ji rêzê salix bidim, bibîne.

Gava ku şaneya hêkê (hêkhucre) digihêje, hîngê ji darê (Hêkpêçek) diweşe û li korîdora (Rêya Hêkê) ku digihê cihê çêbûnê (Kana Zayînê) dadinîşe. Li wir, ew bi "raketşandekê" bi navê sperma (tovgliz) va li hev dikevin. "raketşandekê" ya ku ji aliyê jîndarekî nêrcins va hatiye birêkirin, xwe radide hundirê şaneya

hêkê û wê avis dike. Merema wê ew e ku hayadarîyên mîratî yên nêrcins bigîhînê hundurê şaneyê hêkê. Paşê xwezêdekirina şaneyê destpê dike û li dawîyê şekleke gilokî jê pêk tê. Ew jî berbi cihê çêbûnê (Kana Zayînê) bi rêdikeve û li wir diêwire. Bi vî awayî "rêwîtîya" merivçêbûnê destpê dike.

Meriv dikane awayê aviskirina şaneyê hêkê wekî "kevneteqîneke" merivî binavbike. Di saya wê da, meriv wekî şekleke gilokî dikeve nav dem û dorê. Ew destpê xerckirina demê ya ji temenê xwe dike. Bi gotineke din "saeta jîyana" wî destpê tinginî dike hetanî ku bi destê mirinîyê tê dawestandî.

Ji despêkê da meriv berve her alîyekî gir û berfireh dibe û di pevajoya girbûnê da her ku dihere serî ji nigan bi dûr dike û berwajî vê.

Bi mirinîyê meriv ji hev da dixele û dikeve "quleke reş" ya ku em wekî gorn bi nav dikin. Bi vî awayî paşî li "rêwîtîya" wî ya berve dahatûyê tê.

Dirêjîya temenê merivekî di dûmenzîyonên dordema gerdûnê da pareke pirûpir kin e. Meriv û berhemên wî di împeryaya gerdûnê da tiştên pir perî ne. Meriv dikane bibê, ew di çerxa wê da mîna hewên qumê yên ku bi tenî çavan nayên dîtîne ne. Lê dîsa jî meriv, ji ber pozblindîyê, xwe di navanda bûyerên gerdûnê da dibîne. "kêr bi xewn dîtîyê

ku ew î cêh dixwe!" di metelokeye kurdî da wer tê gotin.

Vatîkanê jî li ser kevneteqînê dîtina xwe aşkere kiribû. Papa bi minesebeta konferenseke zanyarîyê li Romê (1981), di pêşwazîkirina komeke zanyaran da şîret li wan kiribû ku ew ne li ser kevneteqînê bixwe, lê li ser pêşketîyên li pêy wê lêkolînan bikin. Kilîse û dînên din, di ber gîştan jî xiristîyanî û îslamî, ji xêyrî "rastîyên" xwe yên "Xwedêyî", xwe her dem ji ber rastîyê badane. Halbuku rastî dikane ji bo kilîseyê jî bi kêr û komîk bibe. Hûner di awayê katkirina wê da ye. Ma baş nabe ku Papa di gerînên xwe yên berve çaralîyên dunyayê da, mirinê mîna destpêka gerîneke kosmîkî û Xwedê jî mîna serdarê vê gerê bide nasîn? Bi vê, barê gera ji vê dunyayê berve dunyaya din dikane sivik bibe.

Sedasala bîstan ya gelkûjîyê bû. Di vê sedsalê da diktator û komkûjeran berhemên xwe yên bixwîn pêk anîn. Sedasala nijadperestî û milletperestîya cûrbicûr bû. Ew bû sedasala bêrûmetkirin, bindestkirina komhendikîyan û zaroknehezî ya li ser binyada xizanî û qezencxurîyê. Li rûyê dunyayê bi sedmilyonan zarok di bin mercên dijî merivatîyê da wekî karkerên erzan tînen bikaranîn. Ew bi beden û cinsîyeta xwe tînen îstismarkirin. Ew ji mafên binyadî bêpar tînen hîştin. Ez bixwe jî di zaroktîya

xwe da ji mafê hînbûna xwandin û nivîsandinê ya bi makzimanê xwe bêpar hatim hîştin. Makzimanê min û bi dehan makzimanên din li dunyayê tên înkarkirin û bi destê zora dewletî tên bêdengkirin.

Niha dem hatiye ku em xatirê xwe ji vê sedsalê bixwazin. Eger ev pêşdîtina ku dibê, sîya rabirdûyê dê dakeve ser dahatûyê rast derkeve, hîngê li ser dîmenê dahatûyê pir lekeyên reş dê hebin. Henên bibên, wan rêş û ji bîr bikin. Gotin hêsan e lê kirin zor e. Şûna vê, gerek e ku ew di ber çavan ra bîn derbaskirin û bi awayekî nû bîn ronîkirin.

Di sercema sedsala bîstan da rêzek sucên mezin yên li dijî merivatîyê heye. Gerek e ku ew ji bo van li ber "dîwaneke merivatîyê" bê cezakirin û bi vî awayî ji bar û dubarekirina kiryarîyên xwe yên bêtar bê rizgarkirin û ew tenê wengna, him ji berpirsariya rabirdûyê û him jî ji ya dahatûyê serbest bê berdan. Eger mumkun bibe, divê qerara cezadayînê li ser lewheyên şîyarî bîn kutan û ew jî li meydanên serbajarên dunyayê bîn danan.

Rabirdûyê Pir Rûyên Xwe Hene

Ji aliyê keseyatîyê va rabirdû pirûyî ye. Veqasî merivên li rûyê dunyayê, bi mîlyar çêşîdî rabirdû heye. Rabirdû xwe ji her derê herdê da, bi nihêrîna her kesekî wekî din dinimîne. Rabirdû ji bo

her meriv û xelkekî tê meneyeke din. Her merivek şopên rabirdûya xwe, dîmen û bîranîyan wê bi xwe ra kaşdike.

Ji rabirdûyê xatirxwaztin û berî berve dahatûyê kirin, va gotina ya ku her dem tê bilêvkirin, xwaş tê guhê merivan. Lê tecrube tînin ber çavan ku va çikas zor e. Bi teybet ji bo merivên ji xelk û komhendkîyên ku bûne qurbanê şer û komkujîyan. Va ji bo xelkên ku pêşîyên wan yên ku bi cirmên li dijî merivatîyê tên sucdarkirin jî derbaz dibê. Rabirdû bi minesebetên cûda derdikeve ber wan her duyan û dorê li dahatûya wan teng dike. Ji derva da, pir bi hêsanî rola sucdar û qurban li wan tê markirin.

Eger meriv rabirdûyê nas neke, ma ew ê çîng wê ji paş xwe va cibihîle? Xelk hene, rabirdû jî tevê, navûnîşan û kultura wan tên înkarkirin. Ku heldana nimuneyekê bixwaze, yek ji wan jî Kurd in. Liberxwedana wan ji bo rabirdûya xwe ye jî.

Li ba min bixwe, wekî kesekî li xeribîyê dijî, şûna rabirdûyê bilind e. Têkîlîya min bi resim û bîranîyan, bi teybet yên ji dema zaroktî û xortanîyê pir tîr e. Pir caran bi gerên xeyalî serî li kûrahîya rabirdûyê dixim. Sewa ku şûna tuneyîya welat tijî û hesretê wê aş bikim, ehtîyaca min pê vê heye. Resim û bîranîyên ji rabirdûyê dikanin alikar bibin, ku hen bûyêr û serhatîyên rabirdû

ji paş va da, xwe bi rengêkî din bidin ni-
mandin. Dixwazim çend dîmenan li ser
vê ji rabirdûya xwe binim ber çavan.

Gundê ku ez 50 salî (tarîxa sedîsed
nizanim) di ber vê lê hatime dunyayê,
li navî çavên deşteke bilind û bozûqir
ya li nava Anatolîyayê (Tirkîye) dike-
ve. Ew bi destê eşîreke nivkoçber û bi
navê "Xelikî" hatiye avakirin. Va eşîra
bi pirên din va tevhev di nivê sedsala
rabirdû da li nava Anatolîyayê hatibû
bicihkirin. Navê Gund "Xelikan" e, na-
vekî kurdî ye û ji navê eşîrê tê. Ku me-
riv di xerîteya Tirkîyê da lê bigere, raste
vî navî naye. Çunkî navên kurdî li wir
qedexe ne. Lewma Gund bi navê tirkî,
"Karacadağ" hatiye qeytkirin.

Xelikan li derdawê rêzeçiyekî ye. Ji
serî çiyê da, manzereya herdekî pan û
fereh ji meriv va xuya dike. Mergên fe-
reh yên ku bi dehan kerîyên pêz li ser
diçêrin. Li hêla wan jî li berpaş hev ze-
vîyên gênim û cêh. Serîyên wan di me-
hên gulan û hezîranê da, li ber bayekî
sivik pêlên deryakî aştkirî bibîr dianîn.

Jîyan li gorê qeyd û qanunên eşirtîyê
derbaz dibû. Li ba pir kesan gund na-
vika gerdûnê bû. Dunya ew bixwe bûn.
Dunyake çêrokî ku tê da bi ruh, cin,
pêrî, meleka, pîracazu, çavpêvadan,
xwaşkiriya bi destan dihate înakirin. Pê
îna dikirin ku dunya li ser strûyê gayekî
disekine.

Li gund hîngê rabirdû û dahatû wekî
din bûn. Ew li ba gundîyan mina va
dunya û dunya wî alî dihatin zanîn. Va
dunya yanê dunya real li ba wan "dunya
derewin" bû. Dahatû yanê dunyaya wî
alî ya rast bû û mirinî, êmtîhana li pêş
Xwedê û jîyana bêdawî li wir bûn.

Rindî kirin û xwe ji gunehan parêz-
tin qeydeyên rabûn û rûniştinan bûn.
Lê niha, wekî li pir alîyên dunyayê,
prensîba bihatî û kêrhatî ketiye şûna
wan. Di wê wextê da pere wekî hacetekî
kirîne hebû, lê dan û standin, mîna ze-
manê nifşên berê, bi rêya mal bihevgu-
hêrinê dibû.

Demê meneyeke xwe yê din hebû.
Saet tune bû û dema rojê hîn li ser navê
saet, deklîka û sanîyê nehatibû parveki-
rin. Mîna ji berêberê da, merivan xwe li
demsalan, li bilindiya rojê û li teybetên
tebîetê digirtin. Ji hev cihêkirina dema
karkirin û ya serbestmayîne tune bû.
Huro li wir saet û demsaet heye. Meriv
dikane kifşa demsaetê wekî kişekarê lez-
gînîyê binavbike.

Her malekê heywanê xwe hebûn,
piranî mî, bizin, mange û hesp. Me,
xortên gund yên nûgihêştî ji biharê he-
tanî destpêka gihêştina zevîyan hespên
cinsereb dibirin cihê çêrandinê yê ku
jê ra "Korta Bergîran" dihate gotin. Di
nava meydana çêrê ra çemekî zirav yê
ku bi ava kanîstankên piçûk şên dibû

diheriqî. "Korta Bergîran" cihêkî ku xortan jê pir hez dikir bû. Em li wir, ji mala bavê dût, bê talî bi ço û kaw dileyîztin. Me pêşbirka hesp bezandinê li dar dixist. Bê gem, zîn û zengî me hesp dibezandin û xwe pê perçema wan digirt.

Ez wê demê timûtîm bi bîr tînim. Şerên bergîran yên li ser mehînan jî, gava ku ew dihatin delew. Nihêrîna li bihevşabûn û bihevketinên wan yên bi şewat hisên erotîk li me peyda dikirin.

Rojek ji rojên salên 50 yî bû, traktorekî bi merqeya "Jondere" bi rêya li kêlekê çem da hat û li hêla kanîstankê ya ku em li dorê kom bûbûn dawestî. Traktorekî gund yê yekem bû. Bê ku me hay ji hebû, em bi serdema makîneyê hêsîyan. Traktor bi me pir gir û mîna "heyîyeke" ji planeteke din dihat. Ji rengê wî yê hêsîyan bêtir ew li menzeraya wir ya aram nedihat. Guregura motirê wî tirs dixiste dilê me. Hespan bi awirên tirs lê bar û halê xwe yê nerehet didan xuyakirin ku evê ji revê ra hazir in. Di pêy vî traktorî yên din hatin û makîna zevîçînîne û kamyonên bi merqeyên "MAN" û "KRUP" dan pêy wan. Bi hatina wan gund di nava deh salan da ji bînî da hate guhêrîn.

Ketina traktor û makîneyan ya jîyana gund efekteke kevneteqînî bi xwe ra anî. Hesp ji menzeraya gund kêmbûn.

Pir meriv ji karên bi ber hatin bidûrxistin. Pirê wan barkirin bajarên mezin û welatên Ewropayê yên ku wê demê bange karkeran dikirin. Du birayên min xwe li dengê vê bangê girtin û hatin Elmanyayê û min jî da dût wan. Gava ku ez li Elmanyayê bi hebûna firmayên wekî "Jondere", "MAN" û "KRUP" hêsîyam, hîngê ez bi ber têkîlîya hatina van makîneyan ya gund û hatina xwe ya Elmanyayê da çûm.

Zûva ye ku pêlên "magnetîg" yên seneyî û globalîzmêyê bi ser xumalîyên gundê Xelikan yên ku hetanî 30 salî di ber vê, di civateke gundî û ji derva ra girtî dijîyan da hatin xwarê. Wan ji gundîyan hen dane ber xwe û çeng kirin avêtin serbajarên Ewropayê, wekî Stockholm, Kopenhagen, Den Haag, Berlîn û Parîs. Di encama vê da, di navbera rabirdû û dahatûya wan da cihgûhertî û veqetîyek pêk hat. Ji niha şûn da daxa Ewropayê li ser dahatûya wan hebe.

Ku berve rabirdûyê dinihêrim, dibînim ku ez î di pir serdeman da, ji "serdema eşîrtî" hetanî "serdema computer" jiyîme. Gava ku li ser wendayî û guherîyên ji ber leza pêkhatîyan difikirim, çav bi girî dibim.

(Berdewamî tê)

NAR SOR NEBÛ (2)

Mam Recall

– Piştî heşt salan –

Narê Quran dixwend

Ji ber nexweşîya xalê Heydo, daweta Xecikê bi awayeki bêdeng derbas bûbû. Xalê Heydo her çiqas li ser pêyan be jî nexweşîya wî giring û giran bû. Li gora saxitî û ceribandina tixtoran, rewşa wî êdî bêhêvî û neçar dihat nirxandin.

Narê wek hevşîreyekê arîkarîya kalê xwe dikir. Piştî çûyîna Xecikê, êdî keçîka malê Nar bû. Wan rojan hemî qaxûya karên li malê, wek bi tenê ji wê dihat pirsîn.

Hîna yazdeh salî bû. Lê xwe wek keçîkek ciwan û hîn mezintir dihesiband. Bi xwe pir ewle, jîr û bi qîret xuya dikir. Bi wê qîret û rewşa xwe, wek du peyamên giring dida malbat û gundiyan.

A yekemin, wek digot: Ez êdî ne zarok im. Ez jî dikarim wek xwişka xwe Xecikê, hemî karên li malê, li derve û li hevşo bikim.

A duyemin jî: Bi qîret û karkirina xwe, wek him sipasî malbatê dikir û him jî bi rasti ji kalê xwe pir hez dikir.

Lewma her şev ji bo saxitîya wî due dikir û lewma sê caran xetima Quranê bi dawî anîbû.

Her şev bê navber berî xewa xwe, hema hema wek mînak ev dueya li jêr dikir û wiha digot: “Rebîo!

Tu kerem û rehim, xudanê erd û ezman î. Min di zarokatîya xwe da tevî dayik, bav û hevalên xwe, hemî hebûnên xwe yên din jî wenda kirin û qet tucaran gazinde nekirin. Lê wek tu jî dizanî, Heydo him kalê min û him jî bavê min e. Ew ji ber pişîka xwe ya spî pir nexweş e.

Rebiyê min! Tu melhema xwe bişîne û wî wek berê qêm û sax bike. Bila Ezraîlê te qêmîşe wî nebe. *Amin!*“

*

Destpêka wê sibehê, derîyê malê lêdîket. Wek herdem, disa Nar bezî çû û derî vekir. Dît ku ciran û heval ji bo dotina pêz, li benda Gula Îsmê sekinine. Zelalê stuyê xwe dirêjî hundirê malê kir û ji Narê rewşa xalê Heydo pirsî.

Narê bi çavên xwe yên tijî nedikarî bersivêk çawa bide Zelalê.

Ji hundirê odê, dengê kuxîk û nalî-

na xalê Heydo kûr kûr dihate bihîstin. Zelalê carek din ji Narê pirsî: “Keçê, ez dê çawa carekê xalo bibînim lê?”

Narê rahişte destê Zelalê û tevhev ketin hundirê odê. Wê gavê, Gula Îsmê dermanên xalê Heydo dida wî.

Narê bi navî Zelalê, ji Gula Îsmê wiha destûr xwast û got: “Dayê! Zelal dixwaze carekê kalo bibîne?”

Berî Gula Îsmê, xalê Heydo bersîv da û wiha got: “Were Zelaaal! Were keça min, were.. Were fedî neke, qey tu jî êdî ji vê malê yî. Were dayê were.”

Û destê xwe dirêjî bûka xwe ya nû (dergista Bekir) Zelalê kir.

Zelal: Çawa yî xalo?

Heydo: Çawa bibim, keça min! Êdî genimê zevîya me hişk bû, Zelal. Bila hûn her daîm hêşin û qêm bimînin însallah.

Zelal: Xwedê herdem li gel te be û te biparêze xalo...

Heydo: Sipas, Zelala min, zor sipas.

Hevdîtina xezûr û bûkê, bi awayekî fermî, kurt lê xemgîn qedîya... Kê çawa bizanîba ku ew hevdîtina wan bibûya hevdîtina dawiyê.

*

Piştî çûyîna bêrîvanan, kuxik û nalîna xalê Heydo hîn zêdetir dibû. Wê gavê, Nar ketibû bin tirs û berpirsiyarîyek pir mezin. Di heman demê da ber bi aşxanê (metbexê) meşîya û xwast ji kalê xwe ra cezweyek şîr germ bike. Lê bi dengê xalê Heydo hilperî û ji nû ve vejerî odê.

– Narêê!

– Kerem bike kalo...

– Keça min, wan dermanên min bîne, ez hebek din bixwim lê... Êşa min zêde dibe. Ax ax..!

– Kalo! Biborîne, dayê min got tu dermanan nede kalo hetani ez ve-gerîm...

– Tişt nabe lê...

– Kalo, tixtor bi diya min ra gotiye bila zêde dermanan nexwe, Xwedê neke, ew dê pê bimire...

– Keça min, dirêj neke, lêê! Wan dermanan bîneee!

Ev cara yekemin bû ku xalê Heydo li hemberî Narê ewqas bi hêrs diaxivî. Dema ku Narê zerika dermanan anî û danî ber kalê xwe, xalê Heydo bi dengê xemgîn, bi Narê ra wiha got:

– Biborîne, keça min, li min biborîne... Ji ber xopana êşê, nizanim bi kê ra diaxivim... Biborîne.! Û heqê xwe jî helal bike.

– Kalo! Ji bo kuxika te piçek şîr germ bikim?

– Na na, naxwazim. keça min... Sipas.... paşê, paşê.

Xalê Heydo piştî xwarina derman ketibû nav xewek pir kûr. Lê Nar, îcar ji ber bêdengîya xalê Heydo, ketibû bin tirs û meraqeke mezin. Lewma zû bi zû dikete hundirê odê û her carekê xwe bi xwe ev pirsana dipirsî û digot:

– Kalo! Êdî şîr germ bikim?

Kalo! Ez şîr germ dikim...

Kalo! Min şîr germ kir...

Kalo! Şîrê te sar dibe...

Kalo, kalo!

Nar li aşxanê him digirî û him jî li ber Xwedê digeriya. Paşê rabû ser xwe û çû ji odeya xwe Quran anî û ji bo saxitîya kalê xwe, dest bi xwendina sû-reya Yasînê kiribû.

Piştî demekê, xwast carek din sehêtîya kalê xwe bike.

Xalê Heydo, lihêf kişandîbû serê xwe û qet tu deng jê nedihat. Û Narê dîsa bangî kalê xwe kir.

– Kalo, kalo!

Paşê bi rageşîyek (heyecan) mezin, destê xwe dirêjî perê lihêfê kir û bi xuyabûna rewşa xalê Heydo him veciniqî û him jî qîjîya.

– Kalooo! Wêêê, kalê min mirîyee!

Hawar û qîjeqîja Narê, wê gavê hundirê ciranan jî anî xwarê.

Xalê Heydo çû rehma Xwedê

Xalê Heydo ji ber êşên xwe yên giran û dijwar, nedixwast li benda Ezraîl bisekine. Ew ber bi Ezraîlê xwe çûbû. Û bi du qutî xwarina derman dawîya jîyana xwe, bi destên xwe anîbû.

Wê sibehê pir hewl dida, lê nedikarîbû rabe ser pêyên xwe û here avdestxanê. Û bi neçarî, hewce ya xwe, bi arîkarîya Gula Îsmê, di leganekê da kiribû.

Li gora şîrove û gotinên Gula Îsmê, ji ber wê sedemê û lewma xwe kuştîbû.

Mele û mezinên gund, meytê xalê

Heydo dişuştin. Çendek ciwanan jî li derveyî gund, tirba (gor) wî dikolan.

Malbatê hosînameya (vasiyetname) xalê Heydo, li gora xwastina wî bikar dianîn. Lewma mezelê wî, li jora gund û li bogira girekî dihate kolandin. Rehmêtî di saxbûyîna xwe da, ev gotin dikirin û wiha digot: “Eger rojekê ez mirim, bila meytê min nekin nav mezelê gund. Min li dûrî gund, têxin bin axê û bila naxwazim cîhê min jî, ji hêla tukesî da were zanîn. Wan neh zêrên li malê jî bidin Narê. Min ew ji bo saxitîya wê sêwîyê bi berhev xistibû.”

Xalê Heydo di hundirê çardarê da gav bi gav ji gund bi dûrdiket.

Û dengê şîna Narê û Gula Îsmê di heman demê da wek ji devekî derdiket û wiha dihate bihîstin:

– Ax Heydo ax! Te çima hevala xwe xapand lo?

Kalooo! Min bibexşîne kalo.

Ez kûr bibim, ji bo çi çûm xopana bêrîyê.

Ez bûm sedema kalê xwe, welleh ez bûm...

Û heval û hogir, piştî bi cîh kirina xalê Heydo, ji bo sersaxîyê vegehbûn mala wî. Gundîyan tevî hêsirên xwe, behs û pesna xalê Heydo dikirin. Hevalê wî yê herî baş, Melê Osê Zaxo bû. Û Mele wiha digot:

“Miroveki bi xwe bawer û camêr bû. Herdem tevî me, lê wek bi tena serê xwe dijîya. Ez bawer im, lewma

tirba xwe li cîheki dûr xwast. Qet nedixwast kesek ji bo kesekî din, tişteki xirab biaxive, an jî rexneyek çewt bike. Rehmetî miroveki xêrxwaz, dilgir û dilpaqîj bû. Xwedê rehma xwe bide wî û li cîheki bi taybet, bi şûn û war bike.“ (Û digirîya)

“*Amîn, Amîn!*”

Hec Bektaşê Resûl jî wiha qala bîranîyek xwe dikir:

“Min rojekê jê pirsî: Lo Heydo! Mala bavö te ava... De êdî biryara xwe bide lo... Tu ne tevî me dikevî mizgeftê, ne jî tevî civaka cemê dibi... Gelo mirov nizanin ka tu alewî an jî sunnî yî? Rehmetî berê kenîya, paşê wiha bersiv da min:

‘Bektaş, ez kurd im û wek bav û kalên xwe zerdeştî me. Tu karî min li cem ereban nabe û nabim xulamî wan.’ Em demek dirêj bi wê bersiva Heydo î rehmetî dikenîyan. Xwedê rehma xwe bide.”

Û ya rast û dirist ew bû ku ciran û hevalan wek dîrokek bi rûmet qala xalê Heydo dikir û ji dil û can da, heqên xwe li wi helal dikirin.

*

Bêje xaltî – 3

“Xwezî we jî ew bidîta! Mirov ji bo pesna wê, nikare kîjan peyvê bipêyîve û bîne ziman.

Ez qurban, ez qurban..

Hîna biçûk bû. Tevî Xecikê pênc an

şeş salan ji Besika Hec Nûrî, Quran, limêj û due fêr kiribû.

Li kêleka min radiwestî û tevi min pênc wext limêja xwe dikir. Di malbata me da, tenê Bekir, Xecik û Narê Quran dizanin. Heydo rehmetî destûr nedabû zarokên din. Rehmetî hertim wiha digot:

‘Gulê, dinik nebe! Narê wek mîna xwe neke misilman, guneh e... Ew keçika fileh e û bawerî Hezretî Îsa dîkin. Eger rojekê xudanê vê keçikê werin, tu ya çi bersivê bidi wan? Bihêle bila zarok mezin bibin û bi hiş û aqilên xwe biryara xwe bidin. Kî bawerî kê û çi dike, bila bike... Ji te re çi?’

Rehmetî rast digot, lê wan salan dewletê zarokên fileh, yê ermenî kom dikirin. Hin kesan digotin, dewlet van zarokan li Îstebolê bi cîh dike, hindekan jî digotin, ew zarokana tên kuştin. Min qet nedixwast nasnameya Narê were zanîn. Helbet cîranên li derûdorên me dizanîn, lê karkerên dewletê nedizanîn. Me qeyda nasnameya Narê wergerandîbû ser navê xwe. Lê me disa jî çendek salan Nar wek vedişêrî. Û min lewma dixwast bila Nar wek me were zanîn. Min çi bikira, ez qurban?’

Xaltîya Gul carinan xwe bi xwe radiwestî, bêhna xwe fireh dikir û îcar wek diket nav xiyalên kûr û dûr. Ji wan xiyalên kûr, yan bi hêsirên xwe vedişêrî, yan jî bi awayeki rûken digot:

“Heydo î rehmetî, ji Nara xwe pir

hez dikir, pirr...

Me hema hema her sal hirîya pêz û çendek jî berxên nêr difirotin. Rehmetî bi wan peran ji bo Narê zêr dikirîn.

Ji bona xatirê Narê zarokên din jî rihet dikir û li gora kêfa dilên xwe dijîyan. Dema ku Bekir û Xecikê tiştekek dixwastin, hertim Nar diajotin pêş.

Çavên min birijin...

Ji bo mirina Heydo, lome ji xwe dikir û xwe wek kesekî tawanbar didît. Hema hema salekê, wek li xwe û li jîyanê xeyidî bû. Ez bi rewş û halê wê pir xemgîn dibûm. Paşê hêdî hêdî ji bîr kir. Nar şewqa malê bû.“

*

– *Piştî deh salan* –

Nar di govendê da

Wan rojan malbat di nav meraq û rageşîyek (heyecan) mezin da dijîya. Ji ber ku piştî bist rojan daweta Bekir û Zelalê ê dest pê bikira. Lê meraq û rageşîya Narê bi awayeki hîn eşkere xuya dikir û dihat ber çavan. Sedema rageşîya wê, ne tenê dawet bû. Sedemên wê yên hîn giring û balkêştir jî hebûn.

Çawa nebe?

Wê gavê Gula Îsmê tevî herdu bûkan, ji sindoqa xwe, cihîzê ku Marîa Xanimê ji bo Narê hiştî derdixist. Û paşê jî yek bi yek radestî Narê dikir û wiha digot:

“Nara min! Êdî tu qaxûyê min neman. Sipas ji Xwedê re ku min ev ro-

jana bi van çavan dîtin. Ew êdî sindoqa te ye. Bila tiştî xwe ji vê bi şûnde bi xwe veşêre. Lê ez dixwazim ji van herdu perçe qumaşan, ji te ra fistanekî bi taybet bidin durin. Tu ya li dawetê li xwe biki nabe?”

Narê wek axaftinên Gulê qet nebi-hîstibin. Wê gavê ketibû nav xiyalên kûr û bêbinî. Demekê li herdu gustilkan temaşe kir û paşê jî bi rûmetek mezin, ya Marîayê êxist tilîya xwe. Û ew gustilka di tilîya xwe da wek zarokekê demekê çex dikir. (wek mînak pê dilîst.)

Gula Îsmê îşmar dida herdu bûkên xwe û digot:

